



41



Gel bersiv da Komara Tirk:

**“Bi can bi xwîn em bi te  
wre ne ey Serok !”**

Nûçe: Roj tarî nebû stêrk geştir bûn

– Rüpel 8-9

r.5

Şehîd-Bîranîn: “Hûn çiyayên serbilindiyê ne”

– Rüpel 6

r.7

Nirxandin: Warê şer pevçûnê ‘Kurdistan’

– Rüpel 10

r.11

Nûçe: Dewlet ji geşbûna kurdî tirsiya

– Rüpel 16


r.13

**Mahmut Kılınç:** Encama aloziyê

**Serkan Brûsk:** Serboriyek

**Bekir Şîwanî:** Diway rêkewtinî Enkqerec-Şam

**Osman Özçelik:** Komara Derewan



SAMİ TAN

**Îcar li holê bi tenê kurd mane, tevî hemû êrîş û girtinan serî li ber zilmê danaynin û nakevin nava qalibê ku rejîm dixwaze.**

**H**in kes hene, her tiştê wan ji edetan der e. Çi bikin bi awayekî nelirê dikan, bi vê taybetiya xwe navdar in. Gel ji wan re "dinê nedîti" dibêje. Dema mirov bala xwe dide ser awayê pîrozkirina 75 saliya komara tirk, ev yek bi awayekî berbiçav xwe dide der.

Ev pîrozbahî tiştekî din jî nîşan didin. Edî tek ziman, tek netewe, tek welat têrî wan nake, dixwazin civakeke tek bîrdozê bînîn holê. A rast ji mêj ve van ev rê daye ber xwe, lê tu caran wiha vekirî, neketin nava keftûlefta vê doza xwe. Berê dewletê digot: "Çi kesê ku li Tirkiyeyê bijî tirk e." Îcar camêr û canik qîma xwe bi vê yekê naynin, dibejîn çi kesê ku li ser vê xakê dîjî, xwedîyê heman bîr û baweriya siyasi ye. Ew jî bîrdoza fermî ye. Kesê ku derkeve deriveyî vê bîrdozê kî dibe ew zane, dibe hedefa tîrîn rejîmê. Bi darê zorê 75 saliya komarê bi her kesî didin pîrozkirin. Çi çepgir, çi rastgir û çi İslâmî hemû kes bêgav in ku ala tirkan

daleqînin, rozetên 75 saliyê bi pîstê xwe ve bikin. Ev helwesta dewletê dîmenekê tîne ber çavên mirov, wekî riyekê tenê vekirî bihêle, yê mayî asê bike û hemû mirovan bi darê zorê bixe wê riyê. Her kes dikare bo komarê derkeve kolanan, heta, dikare bi darê zorê hinekê din jî bide qîrandin. Kes tiştekî nabêje. Lê dema dayikek bixwaze dilê xwe yê ku agir pê ketiye, ji raya giştî re veke, bi sedan polîs li ser serê wê dicivin û di cih de wê derdest dikan.

İslamîyên ku heta duh ji kemalîzmî re didan çeran, pişti girtina Partiya Refahî û sizandina Tayyip Erdogan bûn serkêşen doza kemalîzmî. Ji bo ku di ber dilê generalan re biçin, hema çi nemaye ku lotikan bavêjin. Lê dîsa nikarin, dilê wan ê ji kêtir hişktir nerm bikin. Çepgir di nava bêdengiyê de ne, jixwe berê jî kesî zêde dengê wan nedîbihîst, îcar bi temamî xwe kişandine nava qalikê xwe.

Îcar li holê bi tenê kurd mane, tevî hemû êrîş û girtinan serî li ber zilmê danaynin û nakevin nava qalibê ku rejîm

dixwaze. Em timtêlên peritî yê komara çeteyan deynin aliye, doza kurdan edî di cîhanê hilnayê. Her wekî hozan dibêje: "Zinge zinga dilê min va ye dîsa deng vedâ/ Dengê doza welatê min dinya girt û bernade."

Her wekî Serokatiya Tevgera Azadîxwaz a gelê kurd gotiye, gelê kurd ber bi dewletbûnê ve gavêni bi xwe ewle davêje. Tiştekî ku xwedîyên rejîmber bi rîbazên dûrî aqilan dajo jî, ev rastî ye.

Ev helwesta gelê kurd tiştekî din jî nîşan dide; hêza sereke ya doza azadiyê li ser vê erdnîgariyê gelê kurd e. Bêyi gelê kurd li ser vê xakê ne demokrasî ne jî azadî pêk tê. Lewre jî ew gotinêni bi şêweyê "li ser hîmê biratî, wekhevî û azadî û komarê bênen ba hev" virên bêbinî ne. Rast e, her wekî pêşyîn me jî gotine 'vir ne kavir'. Lewre jî ne dijwar e ku mirov virêni jî serê xwe mezinir bike. Lê ew vir demek dirêj nikarin mirov ji tengasiyê rizgar bikin.

## Fermo bimeşe, lê li ser vê riyê...

# Ferhengok

TAHIR ORAK

**beyaban:** çol, cihê tenha

**neçê:** nebaş; bêyom

**qaşo:** xwedégiravî (sözde)

**zekem:** arsim, bapêş, grîp

**bûka berfê:** kar-danadam

**heftok:** beştaş oyunu

**komar:** cumhuriyet

**mîner:** temsilkar

**peyker:** heykel

**sayı:** bi tav, zelal

**serborî:** serpêhatî (ani)

**alozi:** anarşî, nexweşî

**xal:** bend, madde

**kambax:** berbad

**şanenavkirin:** imzekerin

**hemwelatî:** hemnişin (vatandaş)

**pozberî:** nakokî (çelişki)

**geş:** canlı, parlak

**rîbâz:** azîn, metod

**lêmişt:** lehî, laser

**tazûg:** xîjik (kızak)

**berfende:** aşit (çığ)

**xelûz:** riçi (kömür)

**şambelot:** kestane

**zembelik:** pîjik, cem-

**çarbûn:** asîrîn, peydabûn

**êsta:** niha, nika

**fırı:** şirê sewalêن yê pêşîn

**derhêner:** yönetmen

**girse:** şenî, kîtle

**tomarkirin:** qeydkirin

**benî:** meşlûl, sucuk

**piyan:** temsî, teyfik (tepsi)

**piyale:** qedeh (bardak)

**kezin:** döseme,

kanalîzasyon

**piskîn:** pinujîn (hapşırma)

**çartek:** dört dörtlük

**fantên:** listika îskam-

bîlan

**deman:** kirê

**jîvan:** randevû

**rekefeñ:** peyman

(anlaşma)

**sizandin:** cezakirin

**derdestkirin:** tutuklamak

**timtêl:** kiyafek, kinc

**pîst:** berstûk, pastîn

(yaka)

**D**i dîrokê de tu caran lîstikan dagirkeran ên li ser gelê kurd kêm ne-bûne. Di dawîya van lîstikan de, parçekirina Kurdistanê pêk hatiye, qirkirin û wêrankirinê bêsinor li ser gelê kurd hatine meşandin. Îcar dîrok ber bi sed-sala 21'emin ve diçe. Hê jî dawîya van lîstikan nehatiye. Bêguman armanca van lîstikan li ser qirkirinê bû. Hêza ku gelê kurd, ji van lîstikan parast, rakire ser piyan û pêşî li ber tunebûnê girt, bêşik hêza PKK'ê ye. Lewre hêzên dagirker û îxaneta rûreş, har û dîn bûne.

Wekî tê zanîn, di sala 1992'yan de dagirker û hezên li başûrê Kurdistanê, bi destûra mîtingeran li hemberî hêzên ARGK'ê şerekî berfireh dane destpêkirin lê, bi ser neketin. Dîsa di sala 1995'yan de careke din bi civîna Dublînê wan xwest ku lîstikeke nû bidin lîstin. Bi êrîşa gerîlayen ARGK'ê lîstika PDK'ê têk çû. Di sala 1998'yan de hê jî lîstik, bi şerekî dijwar didomin.

14'ê gulana 1997'an de dane destpêkirin jî bêencam ma. Di sala 1998'yan de hê jî lîstik, bi şerekî dijwar didomin.

Di encama vî şerî de artêşa tirk kete taqanê û hêzên îxaneta PDK'ê hatin ber belavbûnê, ku hew dikarin xwe li hemberî êrîşen gerîlayen ARGK'ê bigi-

gerandina dek û dolabê din ên veşartî û qirêj in. Di şerî pêşîn de, dixwazin li ber pêşveçûnê li Rojhilata Navîn bigirin. Nêzîkbûna gelên Rojhilata Navîn tirsê dixe dilê wan. Ya din ji bo ku Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê ku hîn nehatiye îlankirin asteng bikin û li ber şoreşê bigirin, dixwazin li bajarên Kurdistanê hikümeteke otonom bidin avakirin. A din, wan dil heye hêzên YNK, PDK û INC (Kongreya Neteweyî ya Iraqê) bikin yek, li hemberî hêzên ARGK'ê şerekî mezin bidin destpêkirin û derfetên ku gelê kurd bi dest xistine jê bistînin. Barzanî xwe daye ber vê yeke. Pişti civîn û hevdîtinê bi rayedarên tirkan re Barzanî çû DYAYê ku şîret û aqîle dagirkeran bi DYAYê bide pejîrandin. Tiştekî xuya dibe, giraniya DYAY di nava lîstikê de di rîza pêşîn de ye. Lî ev yek wê bi hevdîtina Barzanî û Talabani baş zelal bibe.

YNK jî, her çiqas dibêje; "Pêvajoya Enqereyê qediyaye" jî civîna, nûnerên wî li Enqereyê bi rayedarên tirkan re didomin.

# Gel bersiv da Komara Tirk: “Bi can bi xwîn em bi te re ne ey Serok!”

Nûnerê PKK'ê Kanî Yilmaz helwesta PKK'ê ya aşîxwaz bi bîr xist û da zanîn ku li hemberî van komployan meşandina bîryara agirbestê dijwar dibe. Nûnerên partî û saziyên îtalî jî helwesta rayedarên tirk protesto kir û xwest ku li hemberî Tirkîyeyê jî rîbazên ku di kêseya Kosovayê de li dijî Yugoslavyayê têbikaranîn, bênen ceribandin.

**V**ê hefteyê jî rayedarên dewletê bo pîrozkirina 75 saliya Komara Tirkîyeyê lez dan xebatan. Çi dengê ku cuda bû, bi zora polîsan hate xeniqandin. Lî derdarônen kurd serî li hemberî vê helwesta li dijî demokrasiyê dananî. Li gelek deveran çalakiyên “Hûn nikarin roja me tarî bikin” û çalakiyên ku pest û pêkutiyêni li ser HADEP'ê protesto dikin, li nik hev hatin meşandin. Di van çalakiyan de bi sedan kes hatin derdestkirin, ji wan hinek hatin berdan, hinek jî hê di binçav de ne.

## PKK divê di warê navneteweyî de bê temsîl-kirin

Li aliyê din di qada navneteweyî de dengê kurdan berz dibe. Li ser kampanaya çapemeniya tirk a ku li dijî Rûsîyayê dabû destpêkirin, ji gelek welatan vexwendname ji Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan re hatin şandin. Mazûbaniya çalakiya herî girîng jî dîsa Îtalyayê kir. Roja 27'ê kewçêrê Nûnerê PKK'ê yê Ewrûpayê Kanî Yilmaz teví hemû xebatê astengkirinê ê dewleta tirk, li Senatoya Îtalyayê digel gelek par-

le - menterên vî welatî civînek li dar xist. Nûnerên gelek partîyan besdarî di vê civînê de kir û Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bo Îtalyayê hate vexwendin. Di civînê de endamên Komîsyona Têkiliyên Derveyî û endamên partiyêni mîna Liga Bakur, Partiya Keskan, Partiya Çepa Demokratîk û Partiya Komünîst besdarî kir. Li ser daxwaza Dîno Frîsullo civînê bi rawestîna rîzgirtinê bo giyana kesen ku çalakiya ‘Hûn nikarin roja me tarî bikin’ dest pê kir. Di civînê de besdarîn îtalî xwest ku PKK bi awayekî fermî di saziyên navneteweyî de bê temsîlîkirin. Li ser pîrsen rojnamegerên tirk ên bi rengê ‘Öcalan li ku ye?’, Kanî Yilmaz got: “Öcalan li vir e, li Kurdistanê ye, li ba girtiyen xwe şewitandin e. Dev ji légerîna Öcalan berdin, bo kêseya kurdî li çareyekê bigerin.”

Nûnerê PKK'ê Kanî Yilmaz helwesta PKK'ê ya aşîxwaz bi bîr xist û da zanîn ku li hemberî van komployan meşandina bîryara agirbestê dijwar dibe. Nûnerên partî û saziyên îtalî jî helwesta rayedarên tirk protesto kirin û xwestin ku li hemberî Tirkîyeyê jî rîbazên ku di kêseya Kosovayê de li dijî Yugoslav-



Siyasetmedarên Îtalyayê jî Öcalan dawetî welatê xwe kirin.

yayê têbikaranîn, bênen ceribandin.

## Hûn nikarin roja me tarî bikin

Jî bili Ewrûpa û girtîgehan li metropolên Tirkîyeyê jî çalakiyên ‘Hûn nikarin roja me tarî bikin’ pêk hatin. Roja 25'ê kewçêrê li Kadifekaleya İzmîrê li dora 1500 Kurdistanî li hev civîyan û bi sloganên mîna “Hûn nikarin roja me tarî bikin”, “Xortino berê xwe bidin Botanê, herin welatê azad”, “Bi can, bi xwîn em bi te re ne ey Serok” qîriyan. Piştî demekî hêzên dewletê êrîşî girseye kir, girse ji hev belav bû û di çalakiyê de 6 kes hatin derdestkirin, ji wan sê heb hatine girtin.

## Li Edenevê çalakiyên girseyî

Roja 27'ê kewçêrê li gelek taxên Edenevê çalakiyên korsanî pêk hatin. Gelê kurd di van çalakiyan de helwesta xwe li hemberî komploya mezin nîşan da. Di saet li dora 17.30'an de girseyeke mezin riya E-5'ê li ber deriyê Polis Kolêjî birî, bi sloganên mîna “Bijî Serok Apo”, “Kurdistan dê ji faşizmî re bibe goristan”, “Gerîla lêdixe, Kurdistanê ava dike” komploya mezin protesto kir û di demeke kin de ji cihê bûyerê dûr ket. Li taxa Denizliyê jî girseyeke bi qasî 150 kesî bi heman sloganan xwepêşandanek li dar xist. Polîsan êrîşî girseye kir, girse ji hev belav kir. Zarokêni di nav girseye de kevir li erebeyen polîsan barandin. Li Taxa Dağlıoğlu jî li ser riya Obalar saet di 18.00'an de girseyek gîhişte hev û bi sloganên mîna “Hûn nikarin roja me tarî bikin”, “Gerîla lêdixe, Kurdistanê ava dike” dewleta tirk protesto kir. Hêzên dewletê li vir jî êrîşî gel kir û gel ji hev

belav kir.


Li taxa Gülbahçesi jî ji aliyê girseyeke bi qasî 500 kesî ve 20 deqîqeyan sloganên mîna “Bijî Serok Apo”, “Bijî PKK”, “PKK gel e, gel jî li vir e”, “Şehîd namirin” hatin avêtin. Polîsan xwest bi panzeran girseye dorpeç bike, lê gel êrîş bir ser wan, li ser vê yekê wan hêzên xwe bi şûn ve kişandin. Li gorî agahiyan dema çalakî ji hev belav dibû jî, gelek kes hê nû ji bo besdariyê dihatin qadê.

Êvara 28'ê kewçêrê saet li dora 9'an li Ceyhana Edenevê jî hin çalakî pêk hatin. Li pey agahiyan ku bi dest ketine, Kurdistanîyên li vê navçeyê riya E-5'ê birfîne û lastîk şewitandine sloganên mîna “Bijî Serok Apo”, “PKK gel e, gel jî li vir e”, “Kurdistan dê ji faşizmî re bibe goristan”, “Bi can, bi xwîn em bi te re ne ey Serok” qîrandine. Her wiha li Taxa Küçükkrîm, Stadyûm Yolu jî ev çalakî pêk hatine. Van çalakiyan bi qasî sê saetan dom kiriye.

Li aliyê din piştî astengkirina çalakiya Komîsyona Jinan a HADEP'ê, civîna çapemeniyê ya Komîsyona Ciwanan a HADEP'ê jî rastî êrîşa polisan hat. Berî vê çalakiyê jî hêzên dewletê avête ser gelek avahiyan HADEP'ê û bi sedan kes hatin derdestkirin, niha li dor 500 HADEP'î di binçav de ne. Di nav wan de Serokê HADEP'a Stenbolê Mahmut Şakar jî heye.

Rayedarên HADEP'ê roja 27'ê kewçêrê ev êrîş bi daxuyaniyeke çapemeniyê li ber deriyê avahiya HADEP'a Stenbolê şermezâr kir. Li dora 500 kesî besdarî vê çalakiyê bû, piştî ku girse belav bû li dora 60 kesî ji aliyê polisan ve hate derdestkirin.

NAVENDA NÜÇEYAN



## Dê 40 hezar kes besdarî Kongreyê bibe

Me li ser van êrîşen ku berî Kongreya Mezin a HADEP'ê gur bûne, dîtin û boçûnên Sekreterê Giştî yê HADEP'ê Hamit Geylani girtin. Geylani ev êrîş bi tengavbûna xwedîyên rejîmê ve girêda û xwest ku rayedarên dewletê bênen ser riya hiqûq, aşîti û biratiyê. Sekreterê Giştî yê HADEP'ê Hamit Geylani li ser Kongreya ku dê dilî sermawezde pêk were jî ev nirxandin kir: “HADEP piştî li peyxwehiştina serdemeye girtimayînê, bi coşkeke mezin diçe Kongreya Asayı ya 3'ymen. Piştî kongreya 1996'an Serokê Giştî jî di nav de piraniya rayedarên navenda partiya me 18 mehan girtî man.

Tevî van pest û çewsandinê antî-demokratîk gel li HADEP'ê xwedî derketiye. Lewre jî em hê xurtir diçin kongreya sîyemîn. Berî kongreyê li 8 bajaran civînên herêmî pêk hatin. Di 23-24'ê kewçêrê de jî bi besdariya hemû avakarêni partiyê, endamê Meclîsa Partiyê, serokên navce û bajaran û hemû delegen Kongreya Mezin me konferansek li dar xist. Di vê konferansê de arîşeyen navxweyî û yên welêt hatin gengeşekirin û projeyen berbiçav bo diwarojê hatin amadekirin. Komîsyona Navvendî xebatê bo kongreyê gihandine serî. Em pê piştîrast in ku kongreya me ya roja l'ê sermawezê li ‘Yükseliş Koleji Kapalî Spor Salonu’ye pêk bê, dê bi coşkeke mezin derbas bibe. Em li benda besdariyeke bi qasî 40 hezar kesî ne. Lî mixabin hewlîn bo rîlibergirtina xebatê me jî ev mehek e, bi gurehî didomin.”

*Warê şer û pozberiyan û li hemberî mêtîngeran çepereke asê.*

# Kurdistan

î. C. CEMBELÎ

**E**rdînîgariya kurdan di nav berxwedanê wan de hem feyde hem jî zerar daye teverê kurdan. Di nîveka pêşin ya 5 hezar salên dawîn de kurdan li Mezopotamyayê şaristaniyêne girîng damezirandine. Ya dawîn İmparatoriya Med e. Di dewra wan de tixûbêne welêt ji başûr hetanî Kendava İranê dirêj dibû, li bakur nêzîkî devê Deryaya Reş dibû û li Rojava li aliye Deryaya Spî diket. Lê ligel wê berfirehiyê jî kurd tu car nebûne geleki deryayî.

Kurd di navbera 2500 salên dawîn de ji aliye İmparatoriye herêmê ve hatin dorpeçandin. Li hemberî vê dorpeçandinê kurdan xwe vekişandin nav warê bav û kalan, karê wan li hemberî êrişan xweparastin bû. Di navbera sedsalên 10. û 12. de ji bili dewletên Merwanî, Şedadî, Eyûbî û Lorêne mezin û biçük tu hêzeke kurdan a berbiçav tunebû. Lê hin mîrek û eşîrên navenda Kurdistanê û yên bilindahiyêne Zagrosan gelek caran nîvserbixwe û azad ji-yana xwe didomandin. Kambaxiya herî mezin ew bû; welatê wan her dem di navbera du İmparatoriye mezin de warê şer bû. Ev hêz carinan Yewnanî-persî, Romayî-Sasanî, Bîzansî-ereb û carinan jî Osmanî-İranî bûn. Dijminahî û dijberiya van dewletan yekîtiya kurdan ji holê rakir. Kurdistan li ber van kedxweran her dem çepereke asê bû. Hem li ser axa Kurdistanê ceng dikir û hem jî wan Kurdistan talan dikir. Ji bili êrişen asûriyan; İskender û Dara li Hewlîrê, Alparslan û Romen Diyoyen li Melazgirê, Fatih û Uzun Hasan li Er-

zeromê, Şah Simaîl û Yavuz li Deşta Çildêranê (Wan) hatin ber sîngâ hey. Di wan cengan de welatê Kurdistanê birîndar bû. Wekî çeman xwîna kurdan hate rijandin. Dijminahî û dubendiyêne mîrekêne kurdan zêdetir û kûrtir bû.

Tovê dubendiyê cara pêşin ji aliye Strapen İskender ve li Kurdistanê hate çandin. Sala 1514'yan di Cenga Çildêranê de ew birîn kûrtir bû û bi 1639'yan Peymana Qesra Şîrîn re (di navbera dewleta Osmanî û Safewiyan de hate şanenavkirin) rewseke fermî

**Di navbera sedsalên 10. û 12. de ji bili dewletên Merwanî, Şedadî, Eyûbî û Lorêne mezin û biçük tu hêzeke kurdan a berbiçav tunebû. Lê hin mîrek û eşîrên navenda Kurdistanê û yên bilindahiyêne Zagrosan gelek caran nîvserbixwe û azad ji-yana xwe domandine. Kambaxiya herî mezin ew bû; welatê wan her dem di navbera du İmparatoriye mezin de bû qada şer.**

stand. Bi Cenga parvekirina İmparatoriye a yekemîn re Kurdistan bû çar par. Îdî desteserkirina axa kurdan hêsanîr bûbû. Dema ku mêtîngeran nikaribûn serhildanê kurdan bitemirînin, wan ji kedxweren din daxwaza alîkariyê dikir û bi hev re tevger û bizavêne kurdan dipelçiqandin. Dagirkirêne ereb, tirk û faris bi Peymana Lozanê Kurdistan parve kir û wekî hewşike bêderî û bêtirindask hişt. Ew warê kevnar êdi bûbû Girava Ixtîrmanê di nav Deryaya Wanê de. Şûr û xençerên xwînmijan dil û mîjîyê kurdan qelaştin û dirêjiya tixûbê birînê herî kêm 2000 km bû. Hovîtiya wan bêemsal bû. Ne tenê bajar, navce û gund her wiha mezra û aqar jî ji hev hatin vegetandin. Têlén tixûb ên kelemoşk di kêleka navçeyen Çelê, Cizîrê û Nisêbînê re hatibûn kişandin. Bo nimûne li devera Navşar (Şemzînan) ê gundekî eşîra Herkiyan bûbû sê bir. Gundiyek xwedî Nasnameya ereb, yek xwedî ya tirk û yê din jî xwedî ya faris bû. Bi kurtayî sê bira bûbûn hemwelatiyêne sê dewletan.

Ligel mîltarîstî, nijadperestî û çavşoriyan jî dîsa neyarêne kurdan li vê de verê xweşî nedidît. Di berxwedanê van pênce salên dawîn de kurdêne Rojhîlatî, Bakurî û Başûrî xwe li wan çeperekan asê kirin û derbêne giran li dijmin xistin. Bêguman di vê hêlê de erdînîgariya Kurdistanê gelekî bi kêri şoreşa kurdan hat.

Kedxweren ereb, faris û tirk li dijî têkoşîna kurdan gelek peyman girêdan. Di tîrmeha sala 1937'yan de bi besdarbûna Afganîstanê tirk, faris û ereban li paytexta İranê Pakta Sedabadê, di sala 1946'yan de li Enqereye Peymana Cîraniya Baş û Dostaniyê, di 1950'yan de Peymana Bexdayê û di 1975'yan de Peymana Cezayîrê hatin girêdan. Armanca van hemûyan jî bi awayekî hevbes vemirandina agirê şoreşa neteweyî bû.

Di fîrmeha sala 1937'yan de bi besdarbûna Afganîstanê tirk, faris û reban li paytexta İranê Pakta Sedabadê, di sala 1946'yan de li Enqereye Peymana Cîraniya Baş û Dostaniyê, di 1950'yan de Peymana Bexdayê û di 1975'yan de Peymana Cezayîrê hatin girêdan. Armanca van hemûyan jî bi awayekî hevbes vemirandina agirê şoreşa neteweyî bû.




Yavus Sultan Selim

Roja îroyîn jî wezîren karê derveyên van her sê dewletan li Enqere, Bexda û Tehranê li hev rûdinê. Hewldana wan dîsa rîlibergirtina têkoşîna kurdan e. Pêşveçûna kurdan xewê li wan dittemirîne. Dixwazin birayê xwe yê lingşikestî Sedam jî aş bikin û tevli dek û dolabêne xwe bikin.

Nivîskarê ereb Zuhdî El Dahodî di pirtûka xwe ya bi navê "Têkoşîna Kurdistan a Dîrok, Çand û Jînê" beşa bi sernavê "Zagona Gurân" de wiha dibêje: "Dema ku gur bixwazin li ciyayêne Kurdistanê xezalekê bigirin, hetanî ku wê bikujin li pey diçin. Bi hev re radihîjin nêçîra xwe ya li erdê dirêjîkî, li hev parve dikin, nahêlin qurban bibe para ji wan yekî. Dilê wan nabêje bila qurban me ask, xezal an jî berazek be; ji bo wan a girîng derfeta domandina jînî ye û li pey hiştina çend hestîyan û kavilekî ye ku ji wan re bibe alif (êm). Ev zâgomeke guran a surîşti ye."

Her wekî El Dahodî jî diyar dike ku gurek ji wan (Sedam) niha ketiye ser kelaxê qurban (xezal)ê. Hevalên wî ji wê rewşa wî poşman in. Dixwazin di demeke kurt de wî sax bikin û bi xwe re bibin ciyayêne Kurdistanê bo nêçîre wî.



Selahaddin Eyyubi

# Rêzimanê kurmancî

## - Wane 36 -

SAMÎ BERBANG

### Çend mînak:

*Elî mirovekî bas e.**Zilan gulan diçîne.**Welatê wî Kurdistana rengîn bû.*

Li gorî pêveberan hevok dibin du bir, hevokên navdêrî û hevokên lêkerî. Di vî warî de zimanzanê kurd li hev nakin, hinek ji wan didin zanîn ku di kurdî de hevokên lêkerî tunene, yên mayîn li dijî vê dîtinê derdi Kevin. Du bendî ji ber navlêkirina hevokên ku bi lêkera bûn diqedin diqewime. Lêkera "bûn" karekî çalak nişan nade, rewsekê diyar dike. Bo nimûne dema yek bibêje; "ez baş im" di vir de çi çalakî nîn e, bi tenê diyarkirina rewsekê heye. Her wekî berê jî hatibû diyarkirin "baş" rengdêr e û /-im/ jî cînavkê pêrebestî ye. Lê dema mirov bi hûrbînî lê binêre dê diyar bibe ku qertafa /-im/ di heman katê de lêkera bûn jî di nava xwe de dihewîne. Ev rastî dema heman lêker di dema borî de hate çivandin xwe dide der. Gava "Ez baş bûm" hate gotin, lêkera "bûn" bi awayekî berbiçav xwe dide der. Feqî Huseyn Sağnîç digel "hevokên navdêrî" navê "hevokên bûnnî" jî bi kar aniye, li gorî boçûna me jî bo ravekirina mijarê ev gotin di cihê xwe de ye. Piştî vê daxuyaniyê em di-

karin çend mînakân bidin.

### Hevokên lêkerî

*Ez ji mal hatim.**Tu ji gund derketî**Tu ji min ditîrsî**Hevalê min nan nexwar.**Gundiyan pez neçerandin.*

### Hevokên navdêrî

*Elî mamoste ye.**Lerzan nexweş bû.**Osman ji vir e.**Ew ne ji me ne.*

### Bireser

Li ser vê bira hevokê em berê jî rawestiyabûn, di hevokên gerguhez (dervazî) de ew derdi keve pêşberî mirov. Di hevokên ji lêkerên gerguhez pêkhatî de kes û tişte ku rasterê di bin bandora tişte ku tê kirin de dimîne bireser e. Wekî mînak, di hevoka bi rengê "Elî pez çérând." de peyva "pez" bireser e. Lewre tişte ku di bin bandora wî karê "çérândin" de dimîne "pez" e.

Di mijara tewangê de em hinekî li ser vê mijarê rawestiyabûn. Niha jî em dikarin bi çend mînakân mijarê jî nû ve bi bîr bixin.

*Hozan stranekê dibêje.**Gurgîn kincan didirû.**Bivir dar birî.**Min nanek da yekî.*

Li vir pêwistî bi têbiniyekê heye. Di demen niha û bê de bireser hatiye tewandin. Di mînakân jorîn de bireserên "stran û kinc" qertafê tewangê girtine. Di demen borî de kirde ditewe, bireser wekî xwe dimîne. Mînakân vê yekê jî bireserên "dar û nan" in. Di hin devokan de ev répîvan tê pêpeskirin, lewre jî em rastî mînakân wekî "Min Eyşanê dît" an jî "Eyşanê min dît" tênu ku dibin sedema tevliheviyê û hîmî zimên ji binî ve dirûxînin. Lewre li vê derê nediyar e ka kîjan kirde, kîjan bireser e. Mirovekî ku li gorî rêziman perwerde bûbe, ne pêkan e ku ji hev derxe ka kê kî dîtiye.

### Têrker

Têrker ji gelek aliyan ve karê ku tê kirin sergihayî (temam) dikin. Ev sergihayîkirin dibe ku jî aliyê dêmê ve, an cih ve yan jî rewşê ve be.

Her wekî jî ravekirinê jî diyar e, têrker ji binyata xwe de hoker û daçek in, lewre tişte ku lêkeran bi me didin nasîn hoker in û tişte ku wateya hevokê diedilînin daçek in. Dê çend mînak têrî zelalkirina mijarê bikin.

*Gundî li dora gund zivirîn.**Bajarî serê sibê zû diçin karê xwe.**Ez ber bi hevalekî xwe ve meşiyam.**Ez gelekî westiyam.**Kakilê gûzê hêdî hêdî pûc dibe.**Zahîrî yekser xwe gihand ser gir.**Bi tenê ez hatim.**Xwedêgiravî tu bo min çûyi.*

### Hevokên pirsê

Di kurmancî de hevokên pirsê, dema cînavk, rengdêr û hokerên pirsê tunebin, bi alîkariya kirpandinê tênsazkirin. Dema hevok bi awayekî gumanbar bê bilêvkirin, hevoka pirsê derdi keve holê. Kirpandina bi guman li ser kîjan peyvê tişte ku tê pirsîn ew e. Ji bo xurtkirina gumanbaryê daçekên wekî "aya, gelo, ma" jî tênsazkirin.

Mînak:

*Bi hoker, rengdêr û cînavkan**Kî ji çiya daket?**Çi hate serê te?**Kurik bi ku de çû?**Bozo li ku ma?**Kîjan hevalî rî nişanî te da?**Çima te ji min re negot?**Bi kirpandin û daçekan**Dar hatin kişandin?**Elî ji hat?**Zozanê heval birin?**Aya Hecî ji mal derket?**Gelo mizgefta gund temam bû?**Ma tu duh nehatibûyî vir?*

bi firehî cih bistîne?

Dewleta tîrk bi mebesta ku Tevgera Azadiyê zirarî bibîne û bête pelçiqandin gelek caran bêşîur û îrade; hem di nava xwe de û hem jî di qada navneteweyî de aloziyan derdixîne, êrîşan dibe ser hinek dewletan. Heta iro bi mesajen tûj û tedbîrên aborî li dijî dosten gelê kurd helwesta xwe ya tehdîtkar eşkere dikir. Lê iro dixwaze êrîşen leşkerî jî bi kar bîne. Tirkîyeyê bi vê helwesta xwe ya dagirkirî careke din hem di Rojhilata Navîn de û hem jî di dînyayê de xwe da nasîn ku derîyê êrîş û xetereyê ye.


Ciranen wê jî ji iro şûn de divê rastiya xetereyê bibînin, bifikirin û polîtikayen xwe yên li hemberî vê xetereyê jî nû ve binirxînin. Lewma Serokê Parlementoya Yewnanîstanê balê dikişine ser aloziya ku Tirkîyeyê li dijî Sûriyeyê derxistîye û dibêje: "Divê em li dijî êrîşen Tirkîyeyê tedbîrên xwe bistînîn." Tedbîr jî kirîna çekan e. Jîxwe Tirkîye di Rojhilata Navîn de dibe sedema kirîna çekan. Dewleten xwedî çek, dixwazin bi vî awayî hê bêhtir çekan bifiroşin dewleten Rojhilata Navîn ên xizan.

Wekî ku Tirkîye dibêje, di encama aloziya ku bi xwe derxistîye de bi ser neket, Tevgera Azadiyê têk neçû. Heke Serokê PKK Abdullah Öcalan ji Sûriyeyê derketibe jî çûye welatekî hê mezintir û derfet da ku di nav siyaseta dînyayê de bi gîran cih bigire.

Sûriyeyê bi serîdanîna xwe çi bi dest xist? Li Rojhilata Navîn ew wekî dewleteke xwedî hêz û quwet tê xuyakirin. Heta gotinek heye, dibejin "di Rojhilata Navîn de şer û aşî ji bilî dewleta

## Encama aloziyê

MAHMUT KILINÇ



**A**loziya ku Tirkîyeyê de navbera xwe û Sûriyeyê de derxist bi morkirina Peymana Edenevê niha hinekî kêm bû. Heyeten her du dewletan, li Edenevê civînên fermî pêk anîn û peymanek girîdan.

Dewleta tîrk heş xalîn vê peymane eşkere kirin. Bi rastî ev gişk heş xal bûn an xalîn din jî hebûn? Ev, ne eşkere ye. Lakîn di pêşerojê de dibe ku diyar bibin. Dibe ku jî bo parastina berjewendiyen Sûriyeyê hinek xal hebin, lê nayê hesabê dewleta tîrk ku wan ji bo raya gişî eşkere bike.

Mebesta vê guregura dewleta tîrk di Rojhilata Navîn de, pelçiqandin û rakirina Têkoşîna Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê ye. Bi aloziyê çi kete destê dewleta tîrk? Bi rastî weka ku dewleta tîrk dibêje, bi van tehdîtan "serkeftineke dîrokî" bi dest xist an ne? Dîsa di bin her mercî de pejirandina daxwazîn Tirkîyeyê li ser îmaj û îtîbara Sûriyeyê çi kêm kir an jî çi zêde kir? Ji bo me pîrsa herî gişî jî Tevgera Azadiyê derbeyek xwar an kete pêvajoyeke bi xeter? An jî hinek derî dê lê vebin, bêhtir di qada navneteweyî de

Sûriyeyê nabe." Bi nav û deng e û giraniyeke wê heye. Lî belê li hemberî Tirkîyeyê jî bo parastina berjewendiyen xwe bi qasî karîzmaya xwe tu hewl neda. Di qada navneteweyî de jî giraniya dewleta Sûriyeyê dê pişî vê helwesta nerm jî nû ve were nirxandin. Di Rojhilata Navîn de jî bîr û baweriya bi Sûriyeyê şikest. Heçî çiqas hemû dewleten ereb li piş Sûriyeyê cihê xwe girtin jî, îmaj û îtîbara desthilatiya Sûriyeyê li hundir kêm bû. Divê wê li hemberî gefen dewleta tîrk li ber xwe bida.

Wezîrê Sûriyeyê yê karê derve dibêje: "Pirsgirêken di navbera me û Tirkîyeyê de dê bi hevdîtinan çareser bibin. Min iro jî dagirkirina Hatayê nepejirandiye." Heke gotinê wezîr rast bin, divê Tirkîye Hatayê bi hevdîtinan jî Sûriyeyê re berde. An na Sûriye ji daxwazîn xwe tê xwarê. Çimkî eşkere ye ku pirsgirêken di navbera her du dewletan de weka wezîr dibêje bi hevdîtinan çareser nabîn.

Careke din eşkere bû ku bi gef û guran Tevgera Azadiyê têk naçe û ji hev belav nabe. Iro Tevgera Azadiyê bi aloziya ku Tirkîyeyê derxistîye, hê bêhtir ketiye rojeve qada navneteweyî. Hê bêhtir ketiye nav siyaseta dewleten mezintir. Divê em guh nedin şerî psîkolojik.

Weka Serokê PKK'ê Öcalan dibêje: "Bi derketina me ji Enqereye em bûne partî; bi derketina me ji Tirkîyeyê em bûne artes; bi derketina me ji Sûriyeyê û ketina qada navneteweyî jî divê em bibin dewlet." Ev gotinek gelekî di cih de ye. Edî tu dewlet nikarin ji pîrsa Kurdistanê re guhê xwe bigirin.

*İlanen li ser çalakiya "Hûn nikarin roja me tarî bikin":*

# "Hûn Çiyayên Serbilindiyê ne"

**L**i ser çalakiyên li gelek girtî gehêne Kurdistan û Tirkîyeyê yên li dijî komploya li ser Serokê Giştî yê Partiya Karkerêne Kurdistanê Abdullah Öcalan, ji gelek girtigehê û saziyan ilan hatin ragihandin. Ligel girtiyên PKK'yî ji gelek rîexistin û partiyên din yên Kurdistanî û Tirkîyeyî jî, ji bo bîranîna Halit Oral, Ali Aydin, Bülent Bayram, Selamet Menteş, Aynur Artan û Mehmet Güll sermezname weşandin.

Li ser navê girtiyên PKK û DHP'yî yên Girtigeha Sağmal-

cilarê Sadrettin

Aydînlik û Yaşar Şim-

sîr der barê

girtiyên ku

çalakiya

"Hûn nikarin roja me tarî bikin" pêk a-

nîne de, ilanek

ragihand.

Di ilanê de

çalakdar wekî

"Stérkên Ges

yên Roja

Hêviyê" hatine

binavkirin. Her wi-

ha tê diyarkirin:

"Kes nikare roja me ya ku

her diçe li Rojhilata

Navîn ges dibe, tarî bi-

ke. Di dirêjahiya ragi-

handinê de wiha tê go-

tin: "Her êrîşa li dijî roja

me, dike ku raperînê Zî-

lanî pêk werin û stérkên

geştir

vebin. Me daye ser riya Roja Hêviyê

û em dê li ser vê riye jî bigîhîjin ser-

keftinê." Wekî din ligel ilanê ev hel-

best hatiye nivîsin:

Rêwiyên meşa agîrîn ên delodîn /

Rûmetên dîrokê / Çiyayê serbilin-

diyê / Nikarim vebêjîm nemiriya wê /

Zimanê min lê nagere / Gelî mi-

rovîn azad / Wê hemû serhildan /

Axê Newrozîn û gelên serhildêr

behsa we bikin / Hûn Çalakdarê A-

zadiyê..."

**"Em dê bi agîrê canê xwe, yên ku dikin Serokê me bikujin jî, bi-sewitînin"**

Wekî tê zanîn ji Girtigeha Amasyayê Mehmet Güll roja 18 kewçerê agir berdabû canê xwe û roja 27 kewçerê jî şehîd ket. Li ser navê hevalen wî yên girtigehê Ahmet Öğret-

men, Sait Korkmaz, Filiz Kızılkaya û Şükrü Yaşar ilanek ragihand. Di ilanê de Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullâh Öcalan wekî hêviya gelan û girtiyên şehîd jî wekî "abîdeyên agirîn" tên navkirin û daxuyanî wiha tê qedandin: "Em dê bi agîrê canê

xwe,

Dîsa ji Girtigeha Bartinê girtiyên PKK, TKP/MLTÍKKO, PRK/RÍZGARÍ, DHP Nasrullah Kur'an, Nazif Töre, Ramazan Akdağ, Veysel Duran li ser girtiyê Girtigeha Bartinê ilanek ragihand. Di ilanê behsa dek û dolabê Tirkîye, İsrâîl û DYNA' yên li dijî PKK û gelên Rojhilata Navîn tê kirin û tê diyarkirin ku komploya li dijî Serokê Giştî yê PKK'ê ji bo dîlgirtina gelên herêmê hatiye lidarxistin.

**Êdî bi ecela  
xwe mirin, ji  
bo vî gelî  
rûreşîye-  
ke me-  
zin e**


Her wiha li ser navê girtiyê PKK'ê yên li Girtigeha Burdurê Fevzi Yetkin, Aziz Tunçtûrk, Mehmet Tören, Mehmet Kemal ilanek ragihand. Di ilanê bi şêweyekî helbestî wiha tê gotin: "Êdî bi ecela xwe mirin, ji bo vî gelî rûreşîyeke mezin e. Ev heval ne ku ji mirina di şer de ditîrsin, ji mirina ji ber stûxwariyê ditîrsin. Tirsa we jî ji vê yekê ye. Hûn nikarin kana yîyanêye zora vî agîrê ku, wekî peykerên qesâyî we dihelîne, bibin. Ji ber ku agîr zimanê rojê û roj jî, û heta dikare tovîn ixanetê yên ku rizi ne jî, şîn bike. Em dê bi çepêrên agîrîn Serok Apo biparêzin."

Ji bilî van ilanen li ser navê girtiyên PKK'ê yên Girtigeha Semsûrê Salih Ağaç, Zülfükâr

Tak, Zübeyir Perihan û ji Girtigeha Erdemliyê Abdullah Bozkoyun, Nabi Özdemir, İbrahim Barut ilan şandin. Her wiha li ser navê girtiyên adlı yên Girtigeha Metrisê yên welatparêz Demir Kızılkaya, Baran Kızılkaya û Senar Kızıldere jî li ser girtiyên ku şehîd ketine ilanek weşand.

NAVENDA NÜÇEYAN

**"Bi dil, bi can,  
bi xwîn em bi  
te re ne!"**



**AYNUR ARTAN**

*Ma mirin ci ye gula min li  
welatê kor û keran*

*Tew ku tu dîl ketibî û te ji bo  
serfirazîyê sond xwaribe*

*Ma kê neheband ev pelên dîrokê  
yên bi rûmetê....*

*Ji Zindana Amedê agir hilkîsiya  
bircan*

*Bûn yek, gava wa çakûçê Kawa  
li nav dilê xayintiyê xist*

*Zekiye ji Mazlûm  
Ronahî ji Bêrivan*

*Ali ji Halit  
Selamet ji Bülent*

*Agir hilgirt, wekî malê bav  
U niha jî tu, bi meşaleya bi vîna*

*pola ku te hilgirti...*

*Hîn do bû tu dibişiriyî  
Dêrsim*

*Ciyayê Spî, Zagros, Zap, Cûdî,  
Gabar, Andok*

*îro agîrê te bi dilê me ket, ku  
heta hetayê dernekeve*

*Tu, ku dibî ba û diherikî çar  
aliyên welêt*

*Ji baweriya mîrxasan re rîber,  
Hêza Jîyanê, ji bo xwedîyên*

*hêvi, bawerî û hogirtiyê  
Gira te gira me, bawerîya te  
bawerîya me*

*Serkeftina me wê ya herî mezin  
be*

**NAVENDA**

**CANDA MEZOPOTAMYA**

*Şaxê Amed,*

*Hewlîr, Stenbol,*

*Riha, Mêrsîn,*

*Edene, İzmîr*

Xêz: Nihat Türk

□ 3.11.1996:

Qazeya Susurlukê

Roja 3'ye sermawez 1996'an li Susurluka Balikesirê kamyonek û mercedesek li hev qelibin. Sê kes mirin, kesek ji birîndar bû. Yen di vê mercedesê de, Serokcerdevan û mebûsê DYP'ê Sedat Bucak, Serokê Polisan Huseyin Kocadag, Serokê duymenî yê Komeleyen Ülküciyan yê berê Abdullah Çatlî û hevala wî Gonca Us ku li gorî gotinan, ji bo MİT'ê dixebeitî hebûn. Di bûyerê bi awayekî eşkere derkete holê ku di nav Devleta Tirk de çete hene û karên mirokuştun, erojn, dizî û hwd. dikin. Büyera Qazeya Susurlukê hîn jî aliye rayedaren dewletê ve tam nehatiye zelalikirin.



# Di muzîka kurdî de motîvîn neteweyî

**R**oja 22'ye kewçerê li NÇM'ya İzmîrê semîne-rek bi navê "Di muzîka kurdî ya hemdem de motîvîn neteweyî" ku ji alyê xebatkarê Navenda Çanda Mezopotamyayê ya Amedê Hozan Dilşîyar ve hatibû amadekekin, hate lidarxistin. Di semînerê de li ser kevneşopiya muzîka kurdî, di vir de rista jina kurd û mûzîka nûjen hate rawestandin.

Hozan Dilşîyar bi dîroka muzîka kurd dest bi axafina xwe kir û bal kişend kevneşopiya dengbêjiyê. Dilşîyar di vê kevneşopiya bê serif û bê dawî de cihê jina kurd nirxand. Dilşîyar di vî warî de çavkaniyê xwe ji mêvanan re vekirin. Wî, di kevneşopiya denbêjiyê de, ji ber rewş û mercen civaka kurd, jina kurd ji mîre kurd di risteke aktîvtir de dît.

Dilşîyar, muzîka kurd a niha di rewseke xerab de dît, ji ber ku hunermendê kurd berî ku li denbêjîn xwe guhdar bikin an jî lêbikolin û binasin dest bi muzîkê bikin, radibin muzîka nûjen çedîkin. Wî got ku ew, gelek kes û komên ku bi vî rengî muzîkê çedîkin, weki mûzîka kurdî nahesibîne. Lewre ev kes berî ku xwe nas bikin radibin muzîkeke hemdem çedîkin. Dilşîyar wiha berdewam kir: "Di hunereke wiha de ne ew û ne jî gel xwe dibîne,



ji ber ku di wê hunerê de çanda wî gelî tune ye."

Hozan Dilşîyar ji pirsgirêkên herî mezin yet jê ji wekî pirsgirêka zimên dît. Wî got 'ji ber ku baş zimên nizanîn, gelek caran peyvan di-guherin. Di vê pêkanînê de wateyeke din li peyvî tê barkirin.

Dilşîyar ev yet jî ji bo hunera vî gelî wekî pirsgirêkeke mezin dît.

Wî got ku hewce ye hunermend di vî warî de jî pêşketî be, ji bo pêşvebirina zimanê neteweyî kedkar be.

Xebatkarê NÇM'ya Amedê Hozan Dilşîyar, li hember pîrsa "di muzîka kurdî de caz dikare bê bikaranîn?" bersiv wiha da: "Caz şewazek xwezayî ye. Di muzîka kurdî de jî ne caz, lê dengbêjîti ji vê ne pir dûr e, ji ber ku dengbêjîn me hernû bi xwezahî stranên xwe dibêjin." Wî wiha bedewam kir: "Lê disa jî ger em ji koka xwe derkevin û em koka xwe nas bikin ango em hunera xwe pêk bînin, em dikarin cazê jî bi kar bînin rockê jî bi kar bînin.

Hozan Dilşîyar wiha dawî li axafina xwe anî: "Ji bo çekirina muzîkê, berî her tişti guh-darkirin û nirxandina denbêj û strananan divê."

DAVUT ÖZALP /A. WELAT İZMİR

Wekî tê zanîn salona NÇM'ê ya Stenoblê jî ev du meh in hatiye morkirin. Ji ber vê yekê komen NÇM'ê nikarin li cihê xwe çalakiyê xwe pêşkêş bikin. Lî disa xebatkarên NÇM'ê bi alîkariya Navendê Çandê yê din û HADEP'ê çalakiyê xwe didomin. Li gorî vê roja 24'ê kewçerê li HADEP'a Esenlerê Koma Rôjhîlat, li HADEP'a Bağcilarê jî Koma Agirê Jîyan û Koma Azad Konser dan gel. Her wiha roja 25'ê kewçerê li Navenda Çanda Tohumû Koma folklorê Koma Serhildan, lîstikên xwe, ligel wê Ozan Merwan jî stranên xwe ji bo gelên navçeyê pêşkêş kirin.

Yekîtiya Malbatê Mezopotamya jî roja 31'ê kewçerê di bin navê "Ji metbexa kurdan mînak in" de xwarinê kevneşopî yê kurdan wê li HADEP'a Ümraniyeyê bîn çekirin, herwiha Koma Ciya jî wê konsera xwe pêşkêş bike.

Navenda Çanda Mezopotamya heya ku ji xwe re cih bigire û berhemên xwe li cihê xwe pêşkêş bike, wê çalakiyê xwe bi vî rengî bidomîne. Niha sloganı NÇM'ê "Her mal NÇM yek e". li dar e.


□ 1920-1981:

Enver Gökçe Jîyan xwe ji deet da

Helbestan Enver Gökçe li Enquerê, beşa ziman û wêjeya tirkî kuta kir. Dema rayedarê dibistana mecanî ya Kadırgaya Stenbolê bû, ji bo romanen xwe yên siyasi hate girtin û heft salan ceza xwar (1951-1957). Pişte re di rojnameyên Enqereye de tîpîzî û riwîskarî kir. Ji ber sedemén aborî, demeke dirêj û gundê xwe de jiya. Helbesta wî ya pêşîn, di Kovara "Ülkü" de hate weşandin (1943). Ji taybetiyen bilîvkirina helbesta gel, bi peyvî herêmî û bi biwêjîn gelêri, helbesteke xwerû û civakî afirand. Gelek helbesten Pablo Neruda ji bo tirkî wergerandin. Enver Gökçe di 1981'ê de ji nav me koç kir.

## ÇAVDÊRÎ

### Serboriyek



SERAKN BRÜSK

T e got barê dîrokê bi aliyê nabe û te milen xwe dan bin. Te xwe da azadiyê û tu bûyî wateya wê. Tu bûyî şervanê jiyanê, li ciya û newalên welêt geriyayî. Te ji nû ve jiyan zindî kir. Belê, te ji nû ve jiyan zindî kir û ew diyarî gelê xwe kir.

Lê, payizê berî nîhâ bi heft salan tu û sê hevalen hûn ji dara azadiyê hatin weşandin. Ew roj û ev roj min xwest behsa te bikim lê... Çend caran min pel bi hevokên nekirkêr dagirtine û ew çîrandine, her ez dizanim. Nikarim; ji min nayê; hesten min lal bûne; zimanê min xwe xwariye.

Min xwest behsa te bikim. Bîranîna te belav bikim. Bi vê hincetê ez li bergehêne zarokatiyê geriyam, min ew peyda kirin, yek bi yek di hisê xwe de zelal kirin, bi xeyala xwe dewlemend kirin, bi hesten xwe zindî kirin, bi fikra xwe ava kirin lê cardî min kir û nekir min nekarî, ez wan bi pênuşa xwe biherikînim ser kaxiza spî. Her kaxiz sipî ma. Ez jî hest negofî mam. Bawer bike pismam, asoya hesten min tîra çarçovekirina bîranîna te nakin. Min behsa wêneyan kir, hate bîra min. Hîn ku di bîra min de ye, ez hema qala bîranîna xwe bikim. Meha gelawejê bû. 14'ê wê bû. Ez li gund bûm. Min xwe li pêjna te girtibû. Wisa li guhê min ketibû. Lî ne wisa derketibû. Tu li alyê jor bûyî. Min xwe negihandibû te. Lî çûn û hatin her berdewam bû. Ciye em bê ehlî xwe nedîhiştin. Çavên me li riya xwe nedîgerimandin. Roj rojek dîrokî bû. Guhê me li ser nûcayan bû. Ber êvarê bû. Bihustek ji rojê re mabû ku biqulipe. Tîrêjîn wê qels bûn, rûyê wê zer bû, giran giran xwe ber bi avabûnê de berdida. Min jî ji xwe re le temaşê dikir. Min çavên xwe xistibûn nîvî wê, bê ku ez çavên xwe bikutkutînim. Min bi çavên tazî ew xweş dîtibû. Dema ev jarî bi ser rojê de hatibû, tarîtiyê jî, xwe ji wî alyê gund hêdî hêdî bi ser gund de berdida. Tariyê û ronahiyê ez di nava xwe de hîstibûm. Welat di nîvî xwe de hîstibûn. Dîmena jiyan te hawê bîstikê ji min ve xuya kiribû. Tu xak bûyî. Tu li cihê xwe bûyî. Te ev herdu dijberiyen xweristê li ser singa xwe bi wate dikirin. Tu esas û mayinde bûyî. Min ev hîs kir. Min ev dît jî. Tu bûbûyî kevirê neqebe yê xwezayê.

Lewre ew ruhê te yê fireh jiyan dida wê. Jiyan ji navika te derbaşî wê dibû. Ew bi xwîna te zindî dibû. Teqînek. Gurmînek ji jêra ciye li xwezayê belav bûbû. Me hema bîhistibû. Dûvre me dît ku dûmanek ji dewletê bîlind dibe. Me xwe nebibîstî û nedîfî kiribû. Şev bêdeng bûbû. Hawîr aram bû, em jî bi mitale. Bi fereca sîbî re, bi tîrêjîn rojê re, nebixêr serê dewletê xuya kiribû. Rêza gundiyan li pêsiya gund dirêj bûbû. Mirov li ber hev hâtibû rîzkin. Wekî darêne di çeporan de. Yek li pey yekî. Zarok, ciwan, navsalî û kal. Rojê wiha dest pê kiribû.

Belê rojê heman wiha dest pê kiribû. Heta berî nîvro jî bi vî rengî berdewam kiribû. Pişte re gazî bavê te kiribûn. Yekî ji wan bi dengekî bilind, ji bavê te re gotibû ku wî xwedîgiravî wêneyê te dîtiye û tu bi şûf, ciwanî û bedewiya xwe, ji hevalen xwe cûdatir î. Berdewam ji bavê te re gotibû, ma çawa destê te li ciwanekî wisa hêja geriyaye, ma ne heyf û xebîneta ciwanekî wisa ye, ku te ew şandiye nav terorîstan.

Bavê te xwe hinekî ber bi wî de qedimandibû û destê xwe li nav pişta wî dabû. Li nav çavên wî nîribû. Peyva xwe zalal gotibû: Tu jî heyf î. Xwedê zane bê tu jî ku hatî van deran. Niha çavên dayika... Mad li yê tîm nemabû. Soromoro bû. Tenê peyvekî têra hilweşandina avahiya derûniya wî kiribû. Xwe dabû hev û bi qehr bi ser bavê te hilatibû. Lî bavê te bi kêt bû. Peyva xwe gotibû û tesîra wê jî rûbirû dîtibû. Piştre bavê te bi kêt behsa vê bûyerê dikir û gotina xwe wiha diqedand: Min belaheq navê bavê xwe li wî nekiriye.

Çalakiyên dîlêner ser

# Roj tarî nebû

Piştî ku suîkasta li dijî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan diyar bû, li gelek girtîgehê li Kurdistan û Tirkîyeyê gelek dîlêner ser yên PKK'yî li girtiyek DHP'yî li dijî vê komployê bi navê "Hûn nikarin roja me tarî bikin" çalakiya xweşewitandinê pêk anî.

Çalakiya yekemîn roja 9 kewçêrê Halit Oral li dar xist û jiyana xwe ji dest da. Peyre 17 girtiyan çalakiya xweşewitandinê pêk anî. Ji van dîlêner ser ên bi navê, Mehmet Güç, Bülent Bayram, Selamet Menteş, Aynur Artan, Mirza Sevimli û Ali Aydin, jiyana xwe ji dest dan. Girtiyen bi navê Murat Kaya, İsmet İnanç, Meral Kaşoturacık, Seyri İpek, Fettah Karataş, Cennet Güneş, Mehmet Bağrıyanık, Müslüm Muhammed, Kenan Karaslan, Hüsnü Çobanoğlu û Samet Oktay jî birîndar in û tedawiya wan didome. Li ser van rûdanîn raya giştî ya welatparêz û malbatê girtiyan çalakiyên cur bi cur saz kirin. Malbatê girtiyan li gelek bajaran avahîyen partiyen wekî ANAP û CHP dagir kirin û helwesta dewletê şermezár kir. Tevî hemû hewlan jî li ser hemû girtiyan agahî têr bi dest neketin, lewre jî di vê nûçeyê de me cih da jînenîgariya sê dîlêner ser; Halit Oral, Bülent Bayram û Aynur Artan.

Diya Bülent Bayram:

## EZ BI GERİLAYÊ XWE YÊ BIÇÜK SERBILIND IM

Şeva 21'ê kewçerê li Girtîgeha Semsûrê girtiyê bi navê Bülent Bayram çalakiya xweşewitandinê pêk anî. Dayika Bülent Bayram Kezban Bayram, ji ber ku di nav tekoşînê de ji Bülent re gotine 'Gerillarye biçük' ew jî dibêje "Ez bi gerillarye xwe yê biçük şad û serfiraz im." Piştî çalakiyê, Bayram rakirin Nexweşxaneya Dewletê ya Semsûrê, lê li vê derê tu mudaxale lê ne-

kirin. Piştî Semsûrê li Dîlokê û li Nexweşxaneya Balcalı ya li Edeneyê jî teda wî ya Bayram, ji aliye

li cenaze xwedî derketin. Bayram bi besdarbûna nêzîkî 700 kesî hate veşartin. Di dema merasîma cenaze de ji aliye girseyê ve slogan hatin berzkirin û polîsan xwest mudaxale bikin. Malbata Bayram jî li dijî helwesta polîsan derket û ji amîrê wan re got: "Pêwîst e polîs nêzîkî gel nebin." Piştî careke din girseyê dîsa li dijî polîsan slogan berz kirin û bi paş ve vekiysi. Girseyê, piştî pêwîstiyan cenazeyê Bayram ên olî bi cih anîn, tabûta wî li ser milan bi sloganê wekî, "Şehît

Kezban Bayram der barê çalakiya lawê xwe de, ji ber ku di nav têkoşînê de ji Bülent re 'Gerillarye biçük' dihate gotin, wê jî got: "Ez bi gerillarye xwe yê biçük şad û serfiraz im." Kezban Bayram, li dijî bêdengiya rayedarêne dewletê û çapemeniya tirk, hêrsa xwe wiha a-nî zimên: "Edî bes e! Hetanî kengê dê xwîn bê rijandin. Bila ev şerê qirêj bê qedandin. Edî bila dilê dayikan neşewite. Bila rayedarêne dewletê bersivê bidin agirbestî. Me can da di vê riyê de. Çapemeniya tirk jî çapemeniyeke durû ye. Ji ber ci naxwazin rastiya bibînin. Wan serê xwe xistiye nav qûmê. Rastî li vê derê ye. Ew dê heya kengê durûtiya xwe bidomîn." Dayika Bülent Bayram, Kezban Bayram, der barê jiyana Bülent û ketina wî ya nav tevgera şoreşê de jî wiha a-xivî: "Bülent gelekî fedakar bû. Ev fedakariya wî ji biçükaniya wî de tê. Dema ku xwîşk û birayen wî xerabiye dikirin, ji bo bavê wî bi wan de nexeyide xwe dida pêş. Di nav tevgera şoreşê de jî ji aliye hevalen wî û ji aliye gel ve dihate hezkirin." Bavê Bülent

Bayram, Ali Bayram, çalakiya kurê xwe û ya hevalen wî wekî çalakiyeye pir hêja dibîne û wesiyetên wan jî wekî ferman dihesibîne. Bavê Bayram, Ali Bayram li ser wesiyeta kurê xwe wiha got: "Bülent di wesiyeta xwe de gotibû: 'Ger ez şehîd bikevim, hûn karibin min li welêt veşerin, wê baş bibe. Lî ev bi destê we neyê min li Mêrsînê li ba Hevalê Yusuf veşerin.' Me nikaribû em wî bibin welêt, ji ber vê yekê me cenazeyê wî li Mêrsînê veşart."

Piştî merasîma cenaze bi rojekê nêzîkî du hezar welatparêz bi hev re hatin serxweşîya bavê Bülent Bayram, Ali Bayram ji wan re wiha got: "Bi vê çalakiya ku min lawê xwe ji dest da, pêşî dilê min pir şewîf. Lî bi xwedîderketina we, me kul û birînê xwe ji birikirin." Piştî merasîma cenaze bi rojekê nêzîkî du hezar welatparêz bi hev re hatin serxweşîya bavê Bülent Bayram. Ali Bayram ji wan re wiha got: "Bi vê çalakiya ku min lawê xwe ji dest da, pêşî dilê min pir şewîf. Lî bi xwedîderketina we, me kul û birînê xwe ji birikirin."

namirin", "Heval Bülent nemir e", "Şehîdên şoreşê namirin", "Şehîdên şoreşê rûmeta me" û "Bila destê ku dirêji roja me dibin bişkîn" bir cihê gora wî. Piştî ku cenaze hate veşartin, girseyê bo şehîdên şoreşê rawestîna rezgirtinê pêk anî û di dema rezgirtinê de Merşî Neteweyî Ey Raqîp hate xwendin. Bavê M. Halit Oralê ku di çalakiya xweşewitandinê de jiyana xwe ji dest da Mehmet Oral jî besdarî merasîma cenaze bû. Meşa bavê Bülent Bayram, Ali Bayram û bavê M. Halit Oral, Mehmet Oral a li pêsiya cenaze bal kişand. Her du bavê xwedî şehîd got ku çalakiyên kurên wan û hevalen wan riya azadiyê nişan daye.

Em der barê çalakiyê de bi bav û dayika Bülent Bayram re axivîn. Dayika Bayram,

Bavê Halit Oral

Halit Oral pê  
Oral têr balkêş al  
sibandin jî lê ji a  
yeyê leskerî kiri  
din dayika Halit  
PKK'ê şes mehâ

Birêz Oral hûn

✓ Halit di sala  
te ji dayik bû. Li san  
û min li wir dest biy  
pir mizur bû lê gen  
xwe got, wê rojekâ  
re me mala xwe bîrî

Wê demê Halifâ  
neçariyê dest ji  
berda. Me jî ew  
destê tamîrkarâ  
Piştî 12 salan min  
ji karê riyen hesin  
şand, lewre jiyana  
ketibû talûke ye. J  
ku ez li Binxetê  
mabûm we  
latparêzî  
min zû de  
nas kiri  
bû. Yen  
ku bi vê  
yekê he  
siyabûn,  
dil kir  
min bi  
kujin.  
Lewre  
rojekê  
bi dû min ketin. Lie  
tanê û ez neh salan  
cem malbata xwe,  
navâ têkoşînê de ka

Halit çawa û li

✓ Li sala 1992'ke  
Dema ez ji E  
Mêrsînê kiribû. Gaft  
ye, ji ber tevgeren ve  
batê bikin lê bi awate  
zêde dom nake." Pea  
riyam. Piştî çûna mid  
tin. Tiştê ecüb roj  
1994'an dike tevî re  
hirî. Halit pênc mellî  
wan ew şand Girtig  
derê ma. Her ku di  
Berî vê bi meh û nî  
tevahî çar sal û nî  
tevahî 13 sal ceza

# siva komploye didin: êrk geşti r bûn

met Oral

## FONA ME BİSTEKÊ GIRTÎ NAMÎNE

*Akiya "Hûn nikarin roja me tarî bikin" e. Serpêhatiya malbata Oral jî wekî ya Halit alit Oral Mehmet Oral demekê li Binxeîê maye. Her çiqas ew wekî penaber hatiye he- a Sûriyeyê leşkerî kiriye. Piştre derbasî Serxetê bûye lê vê carê jî ji bo dewleta Tirkî et Oral bi salan li gelek welatên ereb geriyaye û neh salan li Erebistanê maye. Li aliyê nsê Oral jî ne dayikeke ji rêzê ye. Anîha jî lawekî wê gerîla ye û ew bi xwe jî ji doza gehê de maye.*

Halit Oral bidin nasîn?

Mêrdînê li navçeya Mahser- en de me berê xwe da Dîlokê tiyê kir. Halit dema biçûk bû, min jê re dihat. Min di dilê se mirovîkî baş û bîbir. Pey- örûnê. Itfa sisiyan lê li vê derê wî ji

*Tê gotin ku polisan ji ber bataniyeya kesk û sor û zer êrîş bîriye ser cenaze....*

✓ Belê. Dema me cenaze ji Nexweşxaneya Balcalî hilanî, polisan gote me: "Divê hûn vêga cenaze hilînin." Lê HADEP'yan got, ew dê pişti du seatan cenazeyê hilînin. Li ser vê yekê tu birayê min rehîn hatin girtin. Pişti du seatan tu nabê hevalan çû ji çarşiyê betaneyeye ku rengên kesk û sor û zer hene, kirîne. Polisan yekser li min da û çêr li me kirin. Gotine me, me ew betaniyê bi qestî kiriye. Lewre wan cenaze revand. Me berî vê ji şofêrê e-rebeyê re gotibû, em dê li nêzî derketina Edeneyê bibînîn. Me telefona destan jî dabû şofêr. Lê li cihê me diyar kiri- bû, me hevûdu nedît. Piştre me tele-

fonî şofêr kir, lê hemû istasyon asê kiribûn. Lewre me bi telefonê jî xwe negihandê. Paşê em bi qası 20 km. meşîyan û me xwe gihande cenaze û me tevî şes errebeyan me berê xwe da Qoserê (Kızıltepe). Hîna em neketibûn na- va Qoserê polisan dîsa em sekandin, wan cenaze ji me stand û dest danî ser nasnameyên me. Peyre jî wan got: "Divê hûn cenazeyê anîha vesérin." Me got: "Em dê sibe vesérin." Dawiyê bi pênc panzeran û gelek errebeyen sî- vil me birin goristana şehîdan. Li yekê şevê wan bi darê zorê cenaze ji me stand û vesart.

*Gelo eleqedariya gel li ser Halit Oral çawa bû?*

✓ Di nava hefteyekê de ez bawer im şes hezar kes ha- te sertêdana me. Lewre gel li şehîdên xwe xwedî derdi- keve. Ji Kurdistan, Tîrkiye û Ewrûpayê gelek sazî û kesen welatparêz û demokrat hatin sertêdana me hine- kan jî telefon kir. Telefona me bîstekê jî girtî namîne. Dawiyê ez dibêjim bila welat hebe û gelê kurd sax be.

FATÎH BENDEWAR /A. WELAT MÊRSİN

Hevalen Aynur Artan:

## EW KANIYA DILGEŞİYÊ BÛ

MIN È BIGOTA

È min  
ne wekî è alemê  
ye  
gur û seyên har  
in hawîrdor  
xwedêgiravî  
min è bigota  
bila roja me jî  
tarî nebe  
stîrkîn me jî  
nexuricin...  
(Cemil Denli)



Aynur Ar-  
tan di sala  
1974'an de li  
Elezîzê ji dayik  
dibe. Bâvî wê  
li sala  
1983'yan de  
di qezaya  
trafîkê de ji-

yana xwe ji dest dide. Lewre li cem apê xwe mezin dibe. Heya dema za- ninghê li Elezîzê dixwine. Piştre li Zanîngeha Dîcleyê li Fakulteya Per- werdehiyê Beşa Biyolojiyê qezenc dike. Artan, heta sinifa sêyemîn li A- medê dixwine. Peyre dest ji zanîngehê berdide û bo doza azadiyê xebatê dike. Di sala 1998'an li Stenbolê tê girtin û wê dişinin Girtîgeha Midyayê. Aynur Artan, roja 22 kewçerê li Girtîgeha Midyadê digel. Selamet Mentes di şerşoka girtîgehê de agir berda canê xwe û jiyanâ xwe ji dest da.

*Apê Aynur Artan Mehmet Artan li ser kesayetiya wê wiha axivî:*

"Aynurê wekî jinê kurd ên klasik paşgotin û lomeya kesî nedikir. Wê xwe gelekî baş perwerde kir. Lewre her tim dixwend. Heya iro min nebî- hîstiye ku navbera wê hin kesan nexwes bûye. Gelekî dilovan û bêhnfireh bû. Wê xwe ji bo gelê xwe fedâ kir. Em jî daxwaza aştî û aramîyê dikan. Lewre bi şer ev mesele naçe seri."

Uğur Balık (NCM): "Me digel Hevala Aynur demeke kurt lê hevalîye- ke têr germ û ji dil û can meşand. Ji ber ku em bi derengî di felsefeya wê gihiştine, em a niha xemgîn in. Em a niha bîryardarî, bêhnfirehî, çoşuya wê fêm dikan. Cara yekemîn min Aynur li nexweşxaneyê nas kir. Wê, ji bo hevaleke me, ku berê nas nedikir, refakatî dikir. Ew, yekser hînî heval û derdora xwe dibû. Dilgermî û dilovaniya wê ya ji bo hevalen xwe bêhem- pa û bêşînor bû."

Carinan hin kes dikan ku, hûn aliyê wê ên ku tu caran we nedîtine, bî- bînîn, bi awayekî hûrbînî rastî û şâşiyê fêm bikin. Ev kes, bi kal û pîr û za- rokan re wekî wan tevdigerin, bi vî awayî dilê wan xweş dikan. Hevala Aynur yek ji mirovîn bi vî rengî bû. Aynur, yek ji şoreşgerên ku xwedan pejinkariyeke hunerî ya bêhempa ne, bû. Bi bêhnfirehî kar dikir û tu caran nedikete tengasiyê. Jixwe wê, gotina "ez nikarim" ji ferhenga xwe deram- bû. Bi vî awayî xebata xwe dikir lê tu caran xwe ji hûmanîzma dûr nedî- xist. Ji ber vê taybetî û tevgerên xwe di nava hevalen xwe de dibû pêşeng. Hevala Aynur berê xwe dida hemû probleman û jê re çareyek peyda dikir. Lewma ji bo hevalen xwe dibû kana dilgesî û çoşiyê."

# Gavêni li bêz mîzîne

**S**erdar bi lez ji dikana xwe derket û meşîya. Hê neh-deh metro ji dikana xwe dûr neketibû, li dû xwe mêtê kir ku du kes li dû wî ne. Di ber xwe de got: "Dibe ku ew jî ji xwe re bi rê ve diçin." Lê gava hinekî din meşîya, di nav mirovên ku bi rê ve diçin de, lez da xwe û hinekî din meşîya. Fêm kir ku her dû zilam bi dû wî ketine. Kete nav tirs û xeyalên dûvedirêj. Li ser tirsê fikirî: "Tirs ci ye gelo?" Lê li bersîva pirsa xwe negeriya. Nedizanî bêje ci, li ci bifikire. Tenê got: "Xwezi ez ji dikanê derneketa-ma." Lê divê ji dikanê derketa. Ji ber ku jina wî ducanî bû û ji nişka ve jana welidînê lê peyda bûbû û li ser telefona diya xwe, dabû ser riya malê. Wê çaxê Serdar yekser dikan spartibû birê xwe û derketibû. Lê ji ber ku êdî nedikarî vege-re dikanê, da ser riya xwe.

Serdar, dema gihîst ber Garaja Farqînê, dîsa li dû xwe mêtê kir. Zilam li dû Serdar bûn. Serdar, cî-nayetênu ku wê dawiyê zêde bûbû, anî bîra xwe. Xwêdanê eniya wî sil kir. Gava çavêni wî bi Garaja Farqînê ketin, êrişen kontrayan, ku li Farqînê diqewîmîn, hatin bîra wî. Tirsa wî lê xedartir bû. Gelô ditirsiya? Lê pir caran digot: "Mîrin ji ku tê bila bê. Ser seran, ser çavan!" Lê a niha ci pê dibe? Na, ne ditirsiya, lê di nava nezan-nînê de bû. Ji ber ku nedizanî ci bike. Car din lez da xwe. Tirsa ku li dilê wî peyda bûbû, dom dikir. Tevzînokên tirsê ji laşê wî diçûn û dihatin. Li dora xwe nihêrî. Mirovekî ku berê hatibû kuştin, anî bîra xwe û xeyala wê bûyerê kir. Zilamê kuştî, seranser li erdê dirêj bûbû, xwîna wî ya sor ji nava wî wekî kaniyeke biçûk diherikiya. Şalê wî kot bû û gomlekê wî hêşîn bû. Di nava xwînê de sor bûbûn. Serdar, di nav xeyalan de car din bi zilamên li pey xwe fikirî, bi ser xwe ve hat û ji xwe pîrsî: "Gelô ev zilam min nekujin?" Ji nişka ve xwe di şûna wî zilamê kuştî de dît. Veceniqî.

Kuceye Garaja Farqînê derbas kir. Li kéléka garajê dikanek miş tijî pêlav, hebû. Dîsa lezand, ber bi dikanênu din ên ku tê de penîr difirotin, nihêrî. Her çiqas bi lez dimeşîya jî, li dikanê dînihêrî. Mêsek li ezmanê dikanê difiriya. Mêşî xwe li ser serîkî penîr danî.

Bi dîtina mêtê re, heywanine cur bu cur hatin bîra Serdar. Ji ber ku bi lez dimeşîya, pirpirokin ketin bîra wî, Gava emrê pirpirokê hate bîra wî, li rewşa xwe fikirî. Got: "Gelô ez jî wek û pirpirokekê me? Ew bi lez difire, ez jî a niha bi lez dimeşim. Ew hefteyekê dijî, dibe ku temenê min jî hindik mabe." Gava ev gotin di mejiyê wî re derbas bûn, veceniqî û bi ser xwe ve hat. Gihîstibû ser kuçeya garaja e-


fikr û xeyalan derbas bû. Ji ber ku li riya erebeyan nenihêrî, hindik ma erebe li wî bixin. Bi tutîna erebeyan derbasî hemberî kolanê bû. Ji ber ku zilam jî li dû wî derbas bûn, erebeyan ji bo zilaman jî li tutînê xistin. Ji wan, zilamek li dû xwe vegeriya, çereke tûj da ser şofêr. Ji ber ku şofêr fêm kir ku qontra ye, xwe bi ser hev de kişand, qet deng nekir. Serdar, gava gihîst hemberî kolanê destê xwe li

rewşê ku, êdî bawer dikir ku wê zilam wî bikujin. Dû re kuştina xwe xeyal kir: "...Wê min bikujin û wê sibê zarokek ji min re çêbe. Ev ci ye gelo? Yek diçe, yek tê. Wê zarokê min sêwî bimîne. Wê jina min bêmîne bimîne. Gelo dê car din bizewice?" Hêstir ji çavêni wî hatin xwarê. Giriya lê deng jê dergediket. Nişka ve bi ser xwe ve hat. Ji ber ku digiriya fedî kir û got: "Ger em ji bo welatê xwe tiştekî dîkin û em diçin, cihê me vala namîne, xem nake." Hê xeyala xwe neqedandibû, zarokê wî yê ku wê çêbe, kete bîra wî. Dîsa dil lê teng bû. Pirsên xwe avêtin he-wayê: "Wê zarokê min bêbab bimîne! Wê zarokê min nikaribe bêje bavo?" Nifirek li halê xwe barand.

Dîsa derbasî hemberî kolanê bû. Li pêsiya wî, rojnamefiroşek hebû. Her dem gava di ber rojnamefiroş re derbas dibû, heta li ser navên rojnameyan nenihêriya, derbas nedibû. Lê içar hîç lê ne-nihêrî. Da ser riya xwe. Di dilê xwe de got: "Gelô ev gavêni min ên dawî ne." Di nav xeyalan de li kuçe yê zivirî, ku ber bi erebeyan ve biçe. Ji gihaştina ber erebeyan re 10–15 metro mabû ku li erebeyê siwar be, zilamê ku temenê wî li dora sî salî bû, wekî bêje "Lê berde!" çav li hevalê xwe yê xort kir.

Xort demanca xwe markaya Bareta kişiştî û berê wê da Serdar, ku lê berde, lê destê xort lerizîn, rûyê wî berê sor bû, dû re spî bû. Lê xort ji nişka ve li rewşa xwe fikirî ku, ew di şûna Serdar de be, wê çawa be. Xort xwe ser-danpê dirêjkirî û birîndar hesiband, ji mirinê tirsîya, wê çaxê nexwest li Serdar berde. Ji nişka ve demanca xwe bi hêrs li erdê xist û li ser kolanê girmînek mezin ji demaneyê çû. Mirovên ku derbas dibûn, bi girmîna demançeyê re li wan nihêrîn. Serdar jî berê xwe da xort. Kêfa wî jê re hat û bişirî, lê vê rewşê zêde dom nekir. Zilamê din rahişt demanca xwe û sê gule li Serdar barand. Ji Serdar axînek çû û li erdê ket. Ji nava Serdar xwîn herikî û erd şil bû. Rûyê Serdar spî bûbû. Zilamê ku gule berdabû Serdar, çengê xort girt û reviyan.

Jina xwe ya ducanî û jana welidîna wê xeyal kir. Hatibû wê



rebeyen ku diçin gundêñ Hezro û Farqînê. Gavêni xwe sist kirin. Êdî, hêdî hêdî dimeşîya. Vê meşî rewşa kûsî anî bîra wî. Çavnebariya temenê kûsî kir û got: "Xwezi-ka emrê min jî sed sal bûya." Dîsa li gotina xwe zivirî. "Gelô emrê min sed sal bûya, wê ci bibûya? Ma qey di vê jiyana bindestî de temenê mirov zêde be ci ye, kin be ci ye?" Her çiqas ev pîrsî ji xwe kîribin jî, li bersiva pîrsên xwe negeriya. Bi awayekî tewşo-mewşo meşîya. Zilam li dû wî bûn. Gihîstibû ber Japon Pasaji. Xwest derbasî hemberî kolanê bibe. Bi van

Navenda Çanda Mezopotamya ya ïzmîrê

● 31.10.98: Roja xwarinên kurd ên kevneşop ya 27'an

"Koma Hemdem" (NCM Mersin), saet: 18.00

● 01.11.98: Konsera Koma Hemdem (NCM Mersin), saet: 17.00

**İleri Gözetleme Kültür ve Sanat Evi**

● 31.10.98: Tiyatro: "De bikuj canê min (Hadi Öldürsene Canikom)- Aziz Nesin, saet: 19.30 (Di vê lîstikê de têkiliya di navbera du jin ên ku ji bîfî wan tu kesî wan tune, tê vegotin.)

## CALAKIYÊN HEFTEYÎ



LI HADEP'a Ümraniye

● 31.10.1998 şemî

Ji xwarinên kurdan çend mînak

Konsera Koma Çiya saet: 15.00

NAVENDA ÇANDA TOHUMÊ


● 31.10.98: Panel: "Kemalizm û Cumhûriyet"

Besdîr: Navenda Çanda Mezopotamya

Rêxistina ÖDP ya Stenbolê, Rojnameya Atılım, Kovara Özgür Gelecek,

saet: 16.00

# 'Dengê Behdînan' vemirî



### Me îro PKK heye

*Hey PKK hey PKK.  
Karê me xebat û çek e  
Hey teq teq û hey teq û teq  
Çare nîne tolê veke  
  
Kurdistan welatê me ye  
Milet hemû li pey te ye  
Hey teq teq û hey teq teq  
Me îro şoreşek heye  
  
Sev û rojêne me xebat e  
Ser û milê me xelat e  
Hey teq teq û hey teq teq  
Me din û iman welat e  
  
Ezidî, fileh, misilman  
Bindest in tev sal û zaman  
Hey teq teq û hey teq teq  
Yan serxwebûn yan jî neman  
  
Ey qahraman ey PKK  
Nâlin Burca Belek e  
Hey teq teq û hey teq teq  
Milet di gel te dilek e (Sebîr Botanî)*

G elê Kurd, helbestvan û şoşegerekî hêja winda kir. Helbestvan û şoşegerê kurd Sebîr Botanî, di hefteya derbasbûyî de li paytexta Norveç Osloyê jiyanâ xwe ji dest da. Botanî, di temenê xwe yê 71 salî de her tim bi helbest û nivîsên xwe li ba gelê xwe bû. Botanî, bi taybetî bi helbest û têkoşîna xwe li herêma Behdînan bandorek mezin kiribû.

Botanî ji ber têkûna tevgera kurdî ya li bâşûrê Kurdistanê, di sala 1991'ê de koçî Ewrû-payê kir. Helbestvanê mezin her wiha endamê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê bû.

### Di riya têkoşînê de temenek

Botanî, di sala 1927'an de li gundê Şuşi ku girêdayî Wanê ye ji dayika xwe bû. Ji ber êrişen dewleta tirk, Botanî bi malbata xwe re koçî bâşûrê Kurdistanê dibe, temenê xwe yê zêde li Zaxoyê diborîne. Di temenê Botanî yê 71 salî de sê dîwanen wî bi navê "Şîn û Şadî", "Dilistan" û "Dengê Metîna û Cûdî" hatin çapkirin.

Helbestvan Botanî, di ciwaniya xwe de ji bo wêjeya kurdî û ya cîhanê eleqeyek mezin nîşan dide. Her wiha Botanî di nav tevgera kurdî de aktif cih digire û di sala 1945'an de li bajarê Müsilê tê girtin. Botanî wekî gelek helbestvanen din, li zîndanê dest bi nivîsandina

helbestan dike. Piştî ji zîndanê derdi keve di berxwedana sala 1961'ê de cî digire.

Botanî di vê demê de ji aliye kî ve, rewşa kurdan bi helbesten xwe tîne zimên, ji aliye kî din ve jî, di rojname û kovarîn wekî Eteaxî, Birayetî û ElIrak de nivîsan dimivîse.

### ...û dema koçberiyê

Di sala 1991'ê de dema tevgera başûrê Kurdistanê têk diçe, Botanî jî, wekî gelek kesan koçî Kampa Silopiye dibe. Ew li vir salekê dimîne û berê xwe dide Norveçê. Helbestvan Botanî li vî welatî wekî penaberê siyasi tê pejirandin û heta koçberiya cîhana din jiyana xwe li Norveçê didomîne.


Sebîr Botanî di helbesten xwe de zimanê gel bi kar tîne. Helbesten xwe bi du misrayan nivîsandine û wekî gelek helbestvanan ew jî, ketiye bin tesîra Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî... Botanî, ji bo şoreşa li bakurê Kurdistanê gelekî kîfxweş dibe û tevgera PKK'ê di helbesten xwe de jî tîne zimên.

Ligel ku wî dixwest li welêt bê veşartin jî, ev yek pêk nehat. Ew roja 27'ê kewçerê li Osloyê hate veşartin. Di merasîma veşartîne de ligel malbata wî, girseyeke ku ji rewşenbirîn kurd pêk dihat besdar bûn.

PERWER BENGÎ

## TİŞK

### Diway rîkewtinî Ankara-Şam



### BEKİR ŞİWANÎ

H eftey rabirdû lem goşeye da amajeman kird bo qeyranî le nakawî nîwan Türkiye û Sûriye û ho û regezekanî palpewenerî teqînewey ew kêşeye lem kate da. Ber le kobûnewey dû rojey nîwan wefdî herdû layen ke le encamî hewlî nawbijî Misir û Îran le nîzîk şarî Edene bestra û lewê eger bo maweyekîş bê awêk be agirî şer da kira, çapemenî turk rojane senariyoy cor be corî şeriyan denûsî û bilaw dekirdewe.

Be corê ke be tewawî şer balî be ser herêmeke da kêşabû. Şrêk ke perpabûnî debû be hoy teqandînewey barûdoxî naaramî Rojhelaî Naverast, ew herêmey ke wekû bermîli barût amadey teqînewey ye û be tenya pêwîstî be dagîrsandinî denke şiqarteyek heye. Kes gumanî lewe niye ke Komarî Türkiye le ser binaxey hereşe û çawsûrkirdinewe û dirustkirdinî dujminî xeyali damezrawe, Enqere ke lem maweye da yadî 75 saley damezrandînî komar dekatewe, berdewam hereşey le derewe kirdiwe û le parçekirdinî Türkiye tirsawe. Hemîse le hewl da buwe bo dirustkirdinî komelgayekî îlmanî û rojawayî, belam encam ren-eroyî û serlêşewawî beşî milet buwe û Türkiye wekû dewlet ne le rojawa pesend dekrê û ne le rojhelaîş mitmaney pêdekrê!

Hemû em hoyane û berdewambûnî rewîfî nasîrûşti mîjûy siyasî û komaleyatî Türkiye û peyrewkirdinî siyasetî nikolîlêkîridin û be resmî nenasînî gelanî ne-turk, komelê giriftî siyasî û civakî way hênatwete pêş bo Türkiye ke le serdeمانî rabirdû ziyyatîr be ser dewletekanî dirawsî da biçê û biyankat be elage bo helwasînî kêşekanî nawxo piyan da. Degerêmewê bo binaxey mebest û delêm aya Türkiye berastî deywîst hêrişekî serbazî berête ser Sûriye, yaxûd hemû hereşê û gureşekanî Enqere bo pelkêşkirdinî Şam bû bo ser mîzî giftûgo bo ewey serkewtînîk saxte dij be bizütînewey rizgarîxwazî Kurdistan tomar bikat? Helbet her le seretawê diyar bû ke mebest ziyyatîr hereşey şer bû nek helgîrsandinî şer, çunke Türkiye le şerî 15 saley dij be gelî kurd da birstî lêbirawê û abûrî datepîwî ew dewlete barî mesref û têcûnî şerîkî derekî bo helnagîrê. Boye le pênavî dûrx-istinewey nîgakan le ser kêşekanî nawxo û le pênavî tomarkirdinî serkeftinîk saxte da giranî xiraye ser hereşê û bazûbadan û çawsûrkirdinewe.

Turkey bew helwêste tiwanî Sûriye bekêş bikat bo ser mîzî giftûgo le çiwarçêwey mercekanî Enqere da danûsan encam bidrê, wate tenya basî asayış bikrê û hîçî tir û akamîş her wa derçû. Sûriye razî bû piştgirî bo Partî Kirêkarânî Kurdistan (PKK) rabigrê, belam aya Türkiye rîjey awî rûbarî Feratî bo Sûriye ziyad kird, yaxûd lîway İskenderûney bo gerandewe? Ba bizanî le diwaroj da welamî Enqere bo dawxaziyekanî Şam ci debêt?!

AMADEKAR: GIRTIGEHA ÜMRANIYE

## DEMSALA JİNA WÊ BÛ

**H**evala Gulistan di sala 1983'yan de li gundê Kevirzêrê, yê ku bi ser navçeya Midyadê ve ye hatiye dinê. Heta pênc saliya xwe li gund mabû. Lê zilma axa li gund hebû. Ji ber zilma axa û began, wan mala xwe birin Midyadê. Lê zilma axa li wir jî dom kir. Ji ber vê, di sala 1988'an de mala xwe birin Stenbolê.

Gulistan ji gundê xwe, ji welatê xwe dûr ketibû.

Li Stenbolê biyanî û xerîbî dikişand. Zarokên zengîn û dewlemendan henekêñ xwe bi Gulistan dikirin. Gulistanê dibistana pêşîn xelas kir. Lê ji ber xizaniyê dest ji dibistanê berda. Di wî emrê xweyî biçük de, kete nava xebatê. Dema ku Gulistan kete sala 10'an, xalê wê hate girtin, 15 rojan di bin işkence û lêdanê de ma. Tu sûc û gunehêñ xalê wê tunebû. Ji bo ku xalê wê kurd bû ji welatê xwe hez dikir, dijmin ew girtibû. Gulistanê jî ev yekzanibû. Ji xwe re digot: "Li welat zilma mîr û axan, li vir jî zora dewleta tirk. Ma ev qedera me ye?"

Gulistanê di salêñ dawî de welatparêzî, azadî û Newroz nas kir. Li şerê ku li Kurdistanê dimeşîya guhdarî dikir. Hêviya wê serfiraziya şer bû. Gulistanê jî Newrozan pir hez dikir. Di Newrozan de kirâsê xwe yî sor û blûzê xwe yî spî li xwe dikir, bi dilxwesi xwe di ser agirê Newrozê de diavêt û li dor agir dîlan digit.

Gulistanê pir ji hevalan hez dikir. Ji bo xelasiya welat dixwest ku tiştekî bike. Dema ku heval nû nas kirin, dilê wê mîna dilê çûkan lê dixist. Evîna welat dilê Gulistanê tijî kiribû. Pir dixwest ku li serê çiyan bibe şervanê azadiyê. Lê hevalan her tim digot: "Tu hîn biçük i, hinekî din jî bimîne." Belê, hevala Gulistan ji bo welatê xwe dixebeitî. Hevalen xwe yên zarok şiyar dikir. Welatparêzî nîşanî wan dida.

Hevala Gulistan di panzdeh saliya xwe de bû. Di buhara jîna xwe de bû. Le dijmin nedixwest ku zarokên kurdan biharan bibînin. Kenê Gulistanê dijmin diqehirand. Dijmin li Fatiha Stenbolê, di 11'ê sibata 1997'an de, saet di 13.00'an de ew û hevalê wê Hamdin Salgin kuşt. Gulistanê mîna rojê dilê me germ dike, çavêñ me ronî dike. Ji bo ku em tola Gulistanê û hevalen wê yên zarok hildin, pêwîst e em riya wan bişopînin. Ji bo ku Gulistanê ji bo welatê xwe xebat dikir, hate şehîtkirin. Ji bo ku em daxwaza Gulistan bi cih bînin, lazime em jî ji bo welat bixebeitin.



### CIVANOK

Zarokên delal, bersiva van tiştan binivîsîn û ji Azadiya Welat re bişînîn...

- Ho dibêjîm Tevşo dibêjîm Bi nav dikim û nabîjîm.....

- Skevftike reş tiji mihêñ beş.....?
- Tenûra ximximî tiji nanê genimê.....?
- Lemo lemo li ber çemo.....?

### • GELÖ BAWÊ TE ŞO İŞ DIKE ?



### CIVANOK

- Yek ú yek
- Yek ú yek
- Teyrê belek
- Zaza bilbil
- Dermanê dil
- Şekir ú şema
- Li ber çema
- Çem çiçiqî
- Av té nema
- Ez zîwana
- nav genima
- Tu jincana
- Dest hevala
- Poçikê bi dû
- Bi erdê çû
- Heta tu çû
- Aqlê min çû

### YEK DUDU

- Yek dud
- Bawer sisê
- Çeqla te
- Çeqla fisê
- Mamo dîno
- Kevir şîno
- Qesra Elî
- Çardeh derî
- Yek jê teker
- Yek jî meter
- Heya sibê
- Ellahû ekber.

### DÎK Ú PİRÊ

Pîrê danê xwe şûşt. Danî ser xêni. Dîk çû nikilek lê xist. Pîrê kevirek li dîk xist. Çavê dîk derxist. Dîk ket rê û çû. Xelkê jê re got: "Dîko, bi ku de?" Dîk hêrs bû û got: "Ji min re nebêjin dîko, bibêjin 'Dîkil axa'"

Gundiyan jê re got: "Dîkil axa tuyê herî ku? Dîko got: "Ezê herim dû leşkerê giran. Bînim ser pîra du diran. Çavêñ min derxistiye, ji bo libek dan...."

## HATINA MIN Û HÊVIYA MIN TU YÎ ZAROK

Ev kesa min  
Ev jana min  
Ev hesreta dilê min  
Ev nalîna min ji bo te ye zarok

Di binê zindanan de  
Di nava çar dîwar  
Û di pişta çardeh deriyan de  
Tu sebr û arama min i zarok

Di sir û seqemê de  
Di bahoz û bagerê de  
Di bin berf û baranê de  
Tu germahiya dilê min i zarok


Di newalên kul û kedera  
Di deryayêñ êş û eleman  
Di bin barê kerb û xemân de  
Tu xemrevîna min i zarok

Di rojêñ reş û tart de  
Tu roja min i  
Hatina min, baweriya mi  
Û hêviya min tu yî zarok  
(BAGER BARAN)

### CIHÊN VALA TIJE BIKIN

Gelî hevalan, ji kerema xwe re dewsa van xalan tije bikin...

- Zikê têr hay ji .....tu ye.
- Şam şeker e..... jê şérîntir e.
- Mar mar e ne ..... jî war e.
- Zimano leq leq ..... teqereq.
- Deng ji ..... tenê nayê.
- Mêr dimire ..... ga dimire .....
- Xwes dibe dewsa xenceran, xwes nabe dewsa.....




# Berhevoka nivîsêñ lêkolîñ Zend derket

Hejmara 5'an a Kovara Înstítuya Kurdi ya Stenbolê Zend derket. Di vê hejmara de gelek nivîsêñ lêkolîñ hene. Di nav vê hêjmara kovarê de yekemîn nivîs, a Memet Turhalli ye. Ev nivîs li ser destana "Kyros" e û ji hêla Kawa Nemir ve ji tirkî hatiye wergerandin.

Nivîsa duyemîn ji hêla Zana Farqînî ve hatiye nivîsin. Farqînî qertafêñ ku dikevin pêsiya peyvan û peyvîn nû çar dikin, hildaye dest. Nivîsa Zagros Haco ya bi sernavê "Çend raman û dîtin li ser ziman û peyvîn kurdi" jî hinêk peyvîn ku ji kurdi derbasî tirkî bûne hildide dest û bi dahûrandinê xwe kurdibûna wan diçespîne.

\* Nivîsa ku li dûv a Zerdeşti tê ji hêla Hesen İbrahîm ve hatiye nivîsandin û der barê turanîzmê de ye. Ev nivîsa ku ji hêla Celalettin Yöyler ve ji erebî hatiye wergerandin, li ser doz û armanca turanîzmê ye û nivîskar bi mînakêñ ji çavkaniyêñ cur bi cur dike ku danerên tevgîra navborî siyonîst in.

Gülseren Deniza di hejmara borî de li ser anatomiya mirovan nivîsandibû, di vê hejmara de jî bi tabloyan "Anatomiya Jinan" derpêş dike. Di vê hejmara kovarê de nivîsêñ ji rewşenbîrêñ erek zêde ne, mînakek bo vê yekê jî nivîsa Fehmî Huveydî ya bi navê "Kêşeya Kurdi" ye. Fehmî Huveydî xembariya xwe derdibe ji ber ku dewletê erek li ser kêşeya kurdi xemsar in. Pişte jî ew agahiyêñ hêja li ser binyat û dîroka kur-



dan rêz dike.

Nivîsêñ Dr. Kemal Sîdo Kurdaxî yên li ser Helmuth von Moltke di vê hejmara de jî didomin. Îcar wî cih daye nivîseke Moltke ya li ser kurdan. Moltke çavdêri û nirxandinê xwe li ser kurdan pêşkêş dike.

Piraniya nivîsêñ di kovarê de bi zaravayê kurmancî ne, tekane nivîsa bi zaravayê soranî ji hêla Dr. Cebâr Qadir ve hatiye nivîsandin, ev nivîs li ser jîne-nîgariya Şerefhanê Bidlîsî û dîroka berhemî wî Şerefnameyê disekine.

Serpêhatiya Tevkijiya Gelyîê Zîlan ku İkram İşler ji devê Hecî Heyder wer-


girtiye, aliyekî dîroka me û zilma Roma reş bi belge dike. Nivîseke din ku hêjaya yî dabaşê ye, ji hêla Memet Bayrak ve hatiye nivîsandin. Bayrak di bin sernavê "Di pêvajoya pêşveçûnê de çanda kurdî û rewşa wê ya îroyîn" de dîroka çanda kurdî û rewşa wê ya niha dide ber tîrêjîn ronahiyê. Pişte vê nivîsa Mehmet Bayrak, du nivîsêñ ku hevûdin temam dikin derdikevin pêşberî mirov; ev her du nivîs jî li ser zimêñ in. Yek ji hêla F. Huseyn Sağnîcî ve, yek ji hêla Şefik Beyaz ve hatiye nivîsandin. Di van nivîsan de têkiliya çand, aborî, nasnavê mirov ê bi zimêñ re tê sayîkirin.

Her çiqas di vê hejmara de bi zaravayê soranî bi tenê nivîsek hebe jî, li ser başûrê Kurdistanê nivîseke lêkolîñ hatiye weşandin. Ev nivîsa ku ji hêla Celalettin Yöyler ve li kurdi hatiye wergerandin, ji hêla Hesen Mihemed ve hatiye amadekirin. Ji bilî van nivîsan, nivîsa Samî Berbang a bi sernavê "Çend têbinî li ser cînavkîn kurdi" û nivîsa Çiya Mazî ya bi sernavê "Bîwêj, gotinîn pêşîyan û gotin" hêjayî dabaşê ne. Samî Berbang di nivîsa xwe de li ser têkiliya di navbera cînavkîn zaravayê kurdi de sekiniye. Her wiha Çiya Mazî jî hevparî û cudatiya di navbera gotinîn pêşîyan û biwêjan de hildaye dest.

SERWÎSA ÇANDÊ

## Mihemed Şêxo li Bakur e

Kesêñ ku pir hindik ji muzîka kurdî haydar in, deng û awaza Mihemed Şêxo baş dinasin, xwendekarê rojnameyê jî li ser jînenîgariya wî û hunermendiya wî çend gotar di rojnameyê de xwendine. Lê kasetê wî li Bakur bi awayekî korsanî dihatin belavkirin, dengê wî yê zelal ji kasetê ku bi awayekî nebaş hati-bûn tomarkirin, dihatebihîstîn.




Kom Muzîk û NÇM'ê dawî li vê rewşê anî û kasetâ wî bi navê "ay lê gulê" da tomarkirin. Di vê kasetê de 12 stran cih digirin. Ji wan du stran gelêri ne, yê mayî newaya gişan ji alîyê Mihemed Şêxo ve hatiye çekirin, gotin û newaya çend heban jî ji hêla Şêxo ve hatiye çekirin. Kesêñ ku li berhemê Mihemed Şêxo guhdarî kirine dizanîn ku ew xwedîyê şewazeke taybet bû. Ev şewaz di nava vê kasetê de jî serdest e.

SERWÎSA ÇANDÊ

## Komara derewan

OSMAN ÖZÇELİK



**K**omara derewan 75 saliya xwe qedand. Ev şes meh in ku Komara Derewan, bi her saziyêñ xwe amadekariya pîrozkirina 75 saliya komarê dikin.

Min pîrozkirina 50 saliya komarê jî dîtibû. Bi qasî ku tê bîra min dewletê ev qasî teşqe çenekiribû. Di 75 saliyê de derew li ser derewan têne kirin. Pêla nîjadperestiyê mîna cereyanê bi laşê komarê girtiye. Di bin bandora cereyanâ nîjadperestiyê de ew bi cizbê ketine. Di 25 salên dawîn de wan welatê me kir gola xwînê, iro bi ala sor her der kirine rengê xwînê.

Ü derewan dikin... dibêjin: "Di 75 saliyê de em bikevin milê hev û din û em bimeşin. Em ji bo berê komarê bimeşin..." Hûn dizanîn berê komarê şîne? Demokrasî, aştî û bipêşveçûn... Derew dibe, ew qasî jî nabe. Derew... ji

serî heta binî vir...

Ku mirov carekê derew kir, êdî nema dawî li derewan tê. Ji bo ku mirov derewekê veşere, mirov mecbûr dimîne ku dereweke din biafirîne û derew li pey hev dibin zîncîr. Heta zîncîr li cihekî biqete dê wisa bidome.

Carinan mirov ew qasî di cih de û ew qasî derewê xwe dubare dike ku dem derbas dibe, mirov bi xwe jî ji derew xwe bawer dike. Dibêjin yek, dixwaze şenîyê gund bixapîne û piçekî bi wan bikene. Dibêje: "Ma we bihîstiye li jêra gundê me balafirek ketiye." Yek ji yekî re, yê din jî yên din re dibêjin. Ji bo ku balafira ketî bibînin, gundî didin pey hev û diçin jêra gund. Gund vala dibe. Mêrikê me, yê ku xwedîyê derewê radibe şalwerê xwe li xwe dike û solê xwe dike pê. Jina wî jê dipirse: "Bi ku de?" Mêrik bersivê dide "wek dibêjin li jêra gundê me balafirek ketiye, ez ê herim wê bibînim."

Ger bingeha avahiyekê çewt hatibe danîn, li ser wê bingehê avahiyekê bilind bibe, wê her dem çewt. Heta ku rojekê avahî hilweše.

Bingeha avahiyâ Komara Derewan jî wisa ye. Komar; li ser derew, durûti,

xapandin, şelandin û bêbextiyê ava bûye. Bingeha rastî, duristî ye. Di bingeha komarê de heq û hiqûq nîn e.

Avakarê komarê derewa yekemîn li padîşê kiriye. Dagirker ketine Stenbol, padîşê bêhêz û bêliv e. M. Kemal û hevalên wî bi daxwaz û destûra padîşê ji Stenbolê dertêñ ku gel rakin ser piyan. Gel bi wan re radibe. Roja ku hêz dikeve destêñ wan, padîşê nas nakin.

Derewa duyemîn û ya mezîn li kurdan dikin. Dibêjin "em bira ne, rabin em bi hev û din re li hemberî dagirkeran şer bikin. Pişte ku dagirker çûn, em ê bi wekhevî bi hev û din re welêt idare bikin."

Komara nû li ser van her du derewan ava dike. Dawiya derewan nayê. Ji bo ku vê derewê veşerîn dixwazin kurdan ji holê rakin. Dîroka 75 saliya Komara Derewan bûye dîroka zilm û zorê; bûye dîroka dîlketin û hêjariya gelê kurd.

Dîroka 75 salan bûye dîroka şerê Şêx Seîd, Şerê İhsan Nûrî Paşa, Şerê Seyid Riza û berxwedana gelê kurd.

Çend salên din ez pê nizanim, lê belê dê Komara Derewan hilweše û wê aştî, demokrasî, wekhevî û pêşveçûn bi rastî pêk were.



# Derheqê Kirmancî de Kombiyayışê Çarîne

Duisburg, 10-13'ê  
nîsane 1998 II

## Zafhûmarê Nameyan

Kirmancî de suffiksanê zafhûmarîye ra yew zî /-î/ ya. Tanî cayan de eke kelime bi vokal biqedîyo, na /-î/ nîvajîyêna. Ma vajî gama ke "ga" beno zafhûmar, beno "gai", lebelê semedo ke di vokalî yenê tê hete (têlewe) herfa pêragirêdayene dekewena miyanê nê di vokalan û kelime bena "gayî". Tanî cayan de semedê asaneya telafûzî ra /-î/ ya peyene kewena û na kelime bê /-î/ vajîyêna bena "gay". Meylê kombiyayış gore, her çiqas ke ziwanê qisekerdişî de tanî cayan de wina bibo zî, ziwanê nuştî (yazı dili) de ganî na /-î/ binusîyo (bêro nuştene).

yewhûmar .... zafhûmar /meylê kombiyayış/ zafhûmar/forme bîni ga..... Gayî vaş wenê..... gay vaş wenê.

vateyî bes niyê, kar jî lazim o..... vatey bes niy, kar jî lazim o.

## V) EDAT

### (PREPOZİSYON Ü POSTPOZİSYON)

#### Çend edatî

No kombiyayış de ma çend edatan ser o vindertî.

#### 1) bi

Edatî "bi" ca ra ca cîya vajîyêno. Sey "bi", "be", "ve", "ebi", "ebe", "eve", "pey". Meylê kombiyayış nê forman ra "bi" ser o yo.

#### Nimûne:

kirmancî ..... tirkî  
Bi qeleme nuşt..... kalemlle yazdım.  
Bi dest werd..... elle yedim.  
EZ şina bi Dîyarbekîr..... Diyarbekire gidiyorum.  
EZ şina ver bi Dîyarbekîr..... Diyarbekir 'e doğru gidiyorum.  
O bi xo ame..... O kendisi (bizzat) geldi.  
EZ bi Roşanî ra şîya..... Roşan ile [birlikte] gittim.  
Ko bi ko géra..... Dağ dağ dolaştı.  
Bi peranê xo erîna..... Kendi parasıyla satın aldı.

#### 2) rê

Tanî cayan de herunda "rê" de "rî", "re" yan zî "r" vajîyêno, labelê meylê kombiyayış nê forman ra "re" ser o yo.

#### Nimûne:

meylê kombiyayış..... forme bîni  
rê..... rî / re / r'  
mi rê..... mi rî / mi re / mi r'  
çi rê ..... çi rî / ci re / ci r'

#### 3) se,sey

Kirmancî de tanî cayan de "se" û "sey" (bi tirkî "gibi", "kadar"), tanî cayan de "ze", "zey", "heze", "hezey", "sê", "zê" yan zî "hezê" vajîyêno. Erebkî de kelimeya "zey", kurmançî û fariskî de zî "sa" (bi tirkî "gibi") esta. Meylê kombiyayış nê forman ra "se" û "sey" ser o yo.

#### Nimûne:

kirmancî ..... tirkî  
xortî sey camêrdan xo ver ro da..... delikanlı erkekçe (yigitler gibi) direndi.

Ez sey to niya..... Ben senin gibi değilim./ Ben senin kadar değilim.

A sey yew vila pulisiyaya bî..... O solgun bir çiçek gibiydi.

Sipi yo se vewre..... Kar gibi beyazdır.

Ehende nemr o ke, se peme..... O kadar yumuşak ki, pamuk gibi.

## VI) KONJONKSİYON

#### Çend Konjonksyonî

No kombiyayış de ma konjonksyonanê (bi tirkî "bağlaç") cêrînan ser o vindertî:

#### 1) ke

Herunda "ke" de tanî cayan de "ki", "ku", "ko", "go" yan zî "gi" vajîyêno.

Meylê kombiyayış nê forman ra "ke" ser o yo.

#### Nimûne:

Kirmancî ..... tirkî  
Tî mevaje ke zurî keno.... Meğer yalan söylüyor muş.

Cîyo ke ez zana, ti zî zanî.... Benim bildığımı sen de biliyorsun.

Xorto ke yeno, birayê min o... Gelen delikanlı kardeşimdir.

Mi nîwaşt ke a keneke bêro.... O kızın gelmesini istemedim.

O ameyo tiya ke biwano.... O buraya okumak üzere gelmiş.

Sîma vajînê ke ma zî vajî... Siz söyleyin ki biz de söyleyelim.

#### 2) eke

Herunda "eke" (bi tirkî "eğer", "şayet") de tanî cayan de "eki" yan zî "ek" vajîyêno. Meylê kombiyayış nê forman eke ser o yo.

#### Nimûne:

Kirmancî ..... tirkî

Biko, eke ti zanî vaje, eke ti nêzanî biperse..... Yavrum, biliyorsan söyle, bilmeyorsan sor.

Eke a bêra, o zî yeno..... Eğer o (dişi) gelirse o (eril) da gelir.

Eke ti nêzanî, ti ci rê nuseñî, ti mecbur î ke binusî?.. Bilmeyorsan neden yazıyorsun, yazmak zorunda misin?

#### 3) zî, kî

Kirmancî de, herunda "jî" "yê kurmançî (kir-daskî) û "dahi" "yê tirkî de ca ra ca "zî", "kî", "jî" yan zî "çî" vajîyêno. Meylê kombiyayış nê forman ra "zî" û "kî", ser o yo.

#### Kirmancî ..... tirkî

Ez zî zana ti zî./ Ez kî zana ti kî..... Ben de biliyorum sen de.

Ma zî va şima zî va./ Ma kî va şima kî va.... Biz de söylediğiniz siz de söylediğiniz.

Erzîngan zî şaristan o. Erzîngan kî şaristan o... Erzincan da kenttir.

## VII) FİLLİ

#### Mesderê Fîllan

Kirmancî de, "-yîş" û "-iyayış" zî suffiksanê mesdaranê fîllan (fiillerin mastar takıları) ra yê. Herunda nê suffiksan de tanî cayan de "yîş", "-iyayış" yan zî iyayış vajîyêno. Kombiyayış ma de nê forman ra "yîş" û "iyayış" amey qabûlkerdene.

#### Nimûne:

dayış, gîrayış, ronayış  
kişiyayış, nusiyayış, vajîyayış

Nînan ra "-yîş" eslê xo de "-îş" o, labelê gama ke vokale dim a "-îş" bêro di vokalî yenê tê hete, o wext "y" se herfa pêragirêdayene dekewena beyntarê (miyan) di vokalan û "îş" beno "yîş". Ma vajî:

da+îş=daiş (da+y+îş (dayış (bi tirkî "vermek")  
gîra+îş=gîraîş gîra+y+îş=gîrayış (bi tirkî "gezmek", "dolaşmak")

Labelê eke eslê fîllî bi konsonante (bi tirkî "sessiz harf") biqedîyo no "-îş" nevurîyêno (nêbedilîyeno), Ma vajî:

berd+îş=berdiş

kerd+îş=kerdiş

ward+îş=wardiş

(Qediya)

Derdorê demokratîk qedexekirina A. Welat nirxand

# Dewlet ji gesbûna kurdî tirsiya

KT ev 75 sal i zimanê kurdî qedexe kiriye û rastiya gelê kurd încar kiriye. A. Welat kelemê çavê KT'ê ye. Ji ber ku wê li hemberî qedexekirin, pişafîn û încarkirinê hebûna zimanê kurdî û dewle mendbûna wî peyitandiye û mantalîteya pişafînê ya 75 salî têk biriye.

**K**T ji bo dengbirîna çapemeniya kurd metodê hovane didomîne. Bi êrişen hovane bi ser çapemeniya kurd de tê. Qedexekirin, sansûrkin û desteserkirin têre nekir icar ji ketina çapemeniya kurd bo beşike Kurdistanê tê astengkirin. Pişî Rojnameya Ülkede Gündemê bi biryara Waliyê Rewşa Awarte roja 13'ê kewçerê ketina Azadiya Welat a herêma navborî hate qedexekirin.

Sedema vê qedexekirinê ci ye? Azadiya Welat bi zimanê kurdî weşanê dike. KT' ev 75 sal in zimanê kurdî qedexe kiriye û rastiya gelê kurd încar kiriye. A. Welat kelemê çavê KT'ê ye. Ji ber ku wê li hemberî qedexekirin, pişafîn û încarkirinê hebûna zimanê kurdî û dewle mendbûna wî peyitandiye û mantalîteya pişafînê ya 75 salî têk biriye. Sedema bingehîn a râlibergirtinê ev e.

Em li ser vê yekê bi serokên partîyan, sendikavan, rojnameger û xwendevanên A. Welat re axivîn.

Serokê HADEP'a Amedê Feridun Çelik:

## KT li ser pişafîna ge- lan ava bûye

KT li ser înkarkinîn û pişafîna gelan hatîye damezirandin. Gelén ku li nirxên xwe yên neteweyî xwedî derdikevin her tim bûne hedefa êrişen wê. Gelê kurd bi Tevgera Azadiyê re xwedî li nirxên xwî derket. Yek ji wan nirxên neteweyî jî ziman e. Çapemenî û weşan jî bo gelê me çav û guh in. Lê weşanên ku bi zimanê me derdikevin ruh, can û dilê gelê me ne. A. Welat yek ji wan sa-



Dîmenek ji Amedê

ziyan e. Lewre dewletê ev yek fam kir û bi biryareke dijhiqûqi rî li ber girt.

## Nûnerê NÇM'ya A- medê Remzi Yıldırım

Hebûna gelan bi çand, ziman û dîroka wan ve girêdayî ye. Bi salan e ideo- lojiya fermî li ser gelê kurd politikayen jiholêrakirin û pişafînê dimeshîne. Li dijî van politikayan ev 15 sal in şerekî dijwar heye. Vê têkoşînê bo kurdan ge- lek sazî û nirx aferandine. Çapemeniya

Kurd jî yek ji van nirxan e.

Lê di vê pêvajoya dawîn de dewleta tirk li dijî çapemeniya kurd gelek astengîyan derdixe. Pêşiyê xwest ekranen MED TV tarî bike. Nahêle Ülkede Gündem têkeve Herêma Rewşa Awarte û di vê dawiyê de jî A. Welat qedexe kir. Dewleta tirk dixwaze bi taybetî kurdan bi giştî jî gelên din ji mafî a- gahtarbûnê bêpar bihêle.

Bi bilindbûna têkoşîna azadiyê re zimanê kurdî jî bi pêş ve cû û bi vekirina Nûnergeha Azadiya Welat re bêtir şax veda. Azadiya Welat bo ziman û çanda kurdî mewziyek e û ev rola wê hêzên serdest ditîrsîne. Em van kirinê li dijî saziyên me şermezâr dîkin.

## Nûnerê Ü. Gündemê yê Amedê İsmet Bakaç

Çapemenî rastiyê derdixe holê. Lê sistêm naxwaze rastî ji tariyê derkevin. Ji ber ku saziyên weki NÇM, KMM, Ülkede Gündem û Azadiya Welat bi vî karî rabûm, ji aliye dewletê ve hatin gitin, qedexekirin û astengkirin. Sendîka- van ji ber ku li dijî şerî qirêj derdikevin, têne sirgûnkin.

Çapemeniya tirk li şuna nûçeyen rast promosyonan belav dike, bi nû- çeyen derewîn mîjîyê gel li hev dixe û

dixwaze gel ji rastiyê dûr bixe. Li hem- berî vê Ülkede Gündem û Azadiya Welat gel ji bûyeren li herêmê diqewimîn û rastiyen agahdar dîkin. Lewre jî ji a- liyê waliyê herêmê ve ketina wan a O- HAL'ê hate qedexekirin. Em biryara waliyê OHAL'ê ya nehiqûqi şermezâr dîkin. Rayedâren dewletê bi geşkirina politikayen qirêj nikarin rastiyê veşîrin û bi van rîbazên hovane nikarin tu en- camê bistînîn.

## Li ser navê Platforma Demokrasiyê ya Amedê: Mehmet Işıktas

Ev râlibergirtina li ber Azadiya Welat li dijî hiqûqê û mirovahiyê ye. Ev êriş bi gelempêri li dijî gelê kurd e. Em vê êrişê wekî ku guleyek berî mirova- hiyê dabin, dinirxînin. Netewe bi zi- manen xwe li ser piyan disekinin. A. Welat jî zimanê gelê kurd e. Ev rûdan yek ji polîtikayen ku KT 75 sal in dido- mîne ye. Ev polîtikayen dewletê her roj rû diguherînin. Li herêmê roj bi roj tî- raja Azadiya Welat zêde dibû û her wi- ha hejmara xwendevanen wê jî zêde di- bû. Vê rewşê bala dewletê kişandê ser xwe. Lewre jî bi awayekî nehiqûqi bi ser Azadiya Welat de hat. Ez li ser navê platformê vê bûyerê şermezâr dikim û em ê her dem bi A. Welat re bin.

